Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1397 | 26-Tîrmeh-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Hozan Comerd: Werin vê axa pîroz û dengê şoreşê bighînin her derê

Solîn Mihemed/ Qamişlo

**Hozan Comerd diyar kir ku Rojavayê Kurdistanê bi berxwedana xwe nasnameyeke gerdûnî ava kiriye û got, “Banga min ji bo her hunermendekî Kurd ew e ku werin vê axa pîroz û bi konsertên xwe dengê vê şoreşê bigihînin her derê.”**





Hunermendê Kurd yê navdar Hozan Comerd bi dengê xwe yê şoreşgerî, têkoşîna çandî û helwesta xwe ya welatparêzî tê naskirin. Ew bi dehan salan di nava Koma Berxwedan de cih girtiye û bûye yek ji dengên naskirî yên berxwedana gelê Kurd.

Ew di sala 1950’î de li Dêrsimê (Hozat) hatiye dinê. Êş, dîrok û çanda herêma xwe kiriye bingeha xebata xwe ya hunerî. Comerd ji salên damezrandinê ve di nava koma Berxwedan a efsaneyî de xebitiye, stranên neteweyî û welatparêzî gotine ku di nava gel de deng veda ye. Ew bi kesayetiya xwe ya rûmetbilind, aram û wekî derwîşekî naskirî ye ku muzîka wî bandoreke kûr li ser guhdarên xwe dike. Gelek berhemên wî yên wekî “Oy Felek” û gelek berhemên din di nava arşîva çanda Kurdî de cihê xwe yê herheyî girtine.Bi dehsalan e ku hunera wî ne tenê li welat, lê li derveyî welat jî ji aliyê Kurdan ve bi hezkirin û rêzdarî tê şopandin.

Hozan Comerd, di çarçoveya pîrozbahiyên salvegera Şoreşa 19’ê Tîrmehê de ji Ewropayê berê xwe da Rojavayê Kurdistanê. Comerd li bajarên mîna Qamişlo û Hesekê bi stranên xwe yên şoreşgerî beşdarî pîrozbahiyan bû û hestên gel vejand.

Di derbarê serdana Rojavayê Kurdistanê Hunermendê Kurd Comerd ji Rojnameya me re axivî.

**‘Ez bi hatina Rojavayê Kurdistanê pir serbilind im’**

Hozan Comerd destnîşan kir ku ew bi serdana Rojavayê Kurdistanê pir kêfxweş e û wiha got: “Rojavayê Kurdistanê bi tekoşîna xwe re di serî de li ser Kurd û Kurdistanê, piştre li Rojhilata Navîn û li seranserî cîhanê roleke dîrokî lîstiye. Ev der xwedî ruhekî gerdûnî ye ku berdêlên pir mezin daye. Tevî hemû astengî û êrişan jî, bingeha çand, huner, sazîbûna civakî, siyasî û parastina rewa bi biryardarî berdewam dike.”

**‘Li Rojava gavên hunerî yên pîroz tên avêtin’**

Hozan Comerd bal kişand ser asta geşedana çand û hunerê ya li Rojava û wiha anî ziman: “Li Ewropayê nêzî 3 milyon Kurd dijîn û derfetên wan ên madî pir in, lê belê ew ruh û pênaseya hunerî ya xwerû li wir tune ye. Mirov dikare vê şiyana kûr li vir, li nava saziyên Rojava bibîne. Li vê axê gavên pir pîroz ji bo hunerê tên avêtin. Ems ê hunermend hatine Rojava û her yekî xebatên cuda meşandine. Heta niha me sê konsêert li dar xistine û wê xebatên me dewam bikin. Pêwîste hunermendên Kurd wekî wezîfeyeke neteweyî serdana Rojava bikin û li kêleka gel bin.”

**‘Fikrê Rêber Apo li cîhanê belav bûye’**

Hozan Comerd di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser bandora şoreşa Rojava wiha got: “Rojavayê Kurdistanê bi berxwedana xwe nasnameyeke gerdûnî ava kiriye. Bi hezaran enternasyonalîst, xwendekar û feylesofên cîhanê berê xwe dan vir û fikrê Rêber Apo naskirin. Lê belê di warê çand û hunerê de em hîn negihîştine asta herî jor a cîhanî. Ji bo vê yekê, banga min ji bo her hunermendekî ew e ku werin vê axa pîroz û bi konsertên xwe dengê vê şoreşê bigihînin her derê.”

## FERHENGA BIWÊJAN

**Dema hebe mêvanî, dema nebe golikvanî:**
- Dizane keyfê jî bike, dizane bixebite jî.

**Dest riya dev nas dike:**
- Her kes riya qenciyê dizane.

**Devê wî tijî ye:**
- Gelek tişt pê re hene; gelek tiştan dizane.

**Dinya dîtiye/dinyadîtî ye:**
- Zana ye; şareza ye; haya wî ji dinyayê heye; xwedîçand e.

**Di binê behrê de digere:**
- Agahiya wî ji her tiştî heye; gelek tiştan dizane; destê wî dirêj e; têkiliya wî bi gelek kesî re heye.

**Dûr dibîne:**
- Hestên wî xurt in; mirovekî zana ye.

**Em bi hev re namirin:**
- Emê hev bibînin ka kî rast e, kî şaş e.

**Ewqas li ser erdê ye ewqas jî di binê erdê de ye:**
- Ne weke dîtina xwe ye; zana ye. (Ji bo kesê kin û ne weke dîtina xwe tê gotin)

**Ewrê bibaran e/ewrê baranê ye:**
- Ne vala ye; tiştin li cem hene; zana ye.

**Ez qumaşê wî nas dikim:**
- Ez pir baş wî nas dikim.

**Ez hesinê wî nas dikim:**
- Bi heman wateyê.

**Ez zanim ka ew çi hesin e:**
- Bi heman wateyê.

**Ez ne yên van salan im:**
- Ez ne xeşîm im.

**Gerên wî di binê behrê de ne:**
- Agahiya wî ji her tiştî heye; gelek tiştan dizane; destê wî dirêj e; têkiliya wî bi gelek kesî re heye.

**Her kes ji tûrikê xwe diaxive/ derwêş ji tûrikê xwe diaxive:**
- Kî çi dizane wê dibêje; her kes li gorê hêza xwe, li gorî zanebûna xwe diaxive.

**Her kes ji zikê xwe diaxive:**
- Kî çi dizane wê dibêje; her kes li gorî hêza xwe, li gorî zanebûna xwe diaxive.

**Keşe yekê dizane pîrê heftan:**
- Tu xwe zana hesab dikî lê ez ji te baştir dizanim; ez ji te zanatir im.

**Keşe yekê dizane kalo heftan:**
- Bi heman wateyê.

**Keşe yekê dizane êzirgîn duduyan:**
- Bi heman wateyê.

**Kesê destê xwe bide ber guhê xwe dizane ka wê çi bêje:**
- Yê di serê xwe de ji karekî re xwe amade bike dizane ka wê çawa bike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Sudoku: Bersiv 84

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 7 | 4 | 3 | 2 | 6 | 1 | 5 | 8 |
| 8 | 2 | 5 | 7 | 1 | 9 | 4 | 6 | 3 |
| 1 | 6 | 3 | 5 | 4 | 8 | 7 | 2 | 9 |
| 4 | 5 | 7 | 6 | 8 | 2 | 9 | 3 | 1 |
| 6 | 3 | 1 | 9 | 7 | 4 | 5 | 8 | 2 |
| 2 | 9 | 8 | 1 | 5 | 3 | 6 | 4 | 7 |
| 3 | 4 | 6 | 2 | 9 | 7 | 8 | 1 | 5 |
| 5 | 8 | 9 | 4 | 3 | 1 | 2 | 7 | 6 |
| 7 | 1 | 2 | 8 | 6 | 5 | 3 | 9 | 4 |

Sudoku:Pirs 85

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 4 | | | | 6 | | 9 |
| | | | 9 | | | 2 | | |
| 5 | 9 | | 8 | 1 | 2 | | | |
| | | 9 | | | 7 | 8 | 1 | |
| | 1 | | | 4 | | | 6 | |
| | 4 | 5 | 6 | | | 9 | | |
| | | | 1 | 7 | 6 | | 9 | 2 |
| | | 7 | | | 5 | | | |
| 9 | | 1 | | | | 4 | | |

## Ji sala 2019’an ve çavê Koçberên Serêkaniyê li vegera biewle ye



Çavê Koçberên Serêkaniyê ji sala 2019’an ve li vegera biewle ye, lê tevî pêşketinên di dosyayên koçberên Sûriyê de heta niha dosyaya Serêkaniyê nehatiye çareserkirin, ji ber ku bajêr hîn jî di bin kontrola Tirkiyê de ye û ferman ji Enqerê tên girtin.**R-5**

## Yekemîn Festîvala Genim li Bajarê Qamişlo

Rêveberê Komîteya Amadekar a Festîvala Genim li bajarê Qamişlo Ebdulrehman Hesen diyar kir ku herêma Cizîrê bi berhema genim navdar e, lewma wan xwest festîvaleke wiha li dar bixin, da ku balê bişkînin ser qonax û awayên çandina genim ji demên kevin ve û heta niha.**R-8**





Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1397 | 26-Tîrmeh-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# DIVÊ QANÛN DERENG NEMÎNIN

Parêzer û Parlamenterê DEM Partiyê yê Wanê Zulkif Uçar diyar kir ku biratiya gelê Kurd û Tirk a hezar salan, pêwîst e bi normên demokratîk bibe pergaleke hiqûqî, dewlet lazim e hesabê sedsala xwe ya paş de ma, baş bike û hiqûqa nû li gorî vê amade bike. Statuya Rêber Apo sitûna serkeftina vê pêvajoyê ye, misogerkirina statuyê jî bi statuya siyasî û hiqûqî ya gelê Kurd re hemwate ye.**R-4**




## Jiyana komînal ji komînaliya seretayî heta projeya Civaka Demokratîk... (2)



Vebijarkên felsefî yên ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi taybetî ji destpêka sedsala 21’an ve pêşkêş kirine, di nêzîkatiya wî ya mijara dewlet û civakê de, guherîneke bingehîn pêk anîne...**R-7**

## Zindawerên çand û hunera Kurdî



Hunermend Mîr Perwer bi laşê xwe ji cîhanê koç kir, lê dengê wî hîn jî zindî dimîne, çiya dengê wî vedigerînin, gund wî diparêzin, bajar jî di helkeft û bîranînên xwe de wî bi bîr tîne, ew bûye sembola dilsoziyê ji zimanê Kurdî re...**R-9**

## Xeta Iraq-Sûriyê-DYA’yê; Zêdeyî 600 hezar ton sotemenî hatiye hinardekirin

Xeta ji bo hinardekirina petrola Iraqî bi rêya Sûriyê ber bi DYA’yê ve, ji destpêka Nîsanê ve ketiye pratîkê û heya dawiya Hizêranê zêdeyî 600 hezar ton petrola xav hatiye hinardekirin.**R-3**





Rêwîtiya ber bi ronahiyê ve
Berîtan Xalid R-2



Siya kûr a Tirkiyê di Meclisa Şamê de
Pêjder Altan R-6



Hîmê siberojê
Remezan Olçen R-9

# ‘Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ne daxwazeke lê pêdiviyeke’

Endama Akademiya Zanista Civakî ya Rêber Abdullah Ocalan Rûken Welat da xuyakirin ku Rêber Apo aktorê sereke ya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e. Ji bo vê jî pêwîst e ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, gavên qanûnî bên avêtin. Pêkanîna Mafê Hêviyê ya Rêber Apo merca serkeftina pêvajoyê ye û wiha got: “Bi jinê re hêza pêkanîna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk zêdetir dibe.”

**Aryan Hesen/Qamişlo**

Di 27’ê Sibata 2025’an Rêber Apo bi daxuyaniyekî banga “Aştî û Civaka Demokratîk” raghand. Ev banga Rêber Abdullah Ocelan destpêkek ji bo jiyenek aştî ye û dawî ji bo cîhana şer e. Lê belê tevahî gav di pêkanîna vê pêvajoyê de yek alî dibîne, Rêber Apo û tevgera azadiyê ji bo serxistina vê pêvajoyê gavên girîng avêtin. Lê li beramberî wê dewleta Tirk tu gavên ber biçav neavêtin. Pêwîste gavê destpêkê di vê pêvajoyê de azadiya fîzîkî ya Rêber Apo be, ji ber ku beyî sermûzekervanê aştiyê pêvajo naçe serî.

Herwiha divê bi derbasbûna sal û nîvekê li ser banga Aştî û civaka Demokratîk re gavên qanûnî derbarê azadiya fîzîkî Rêber Apo de bên avêtin, lê dewleta Tirk hîn jî di terzê xwe ya berê de dayatma dike. Di haman demê de di 18’ê Adara 2014’an de DMME’yê biryar da û xwest Tikiyê mafê hêviyê bide Rêber Apo, lê tevî derbasbûna demek dirêj di ser vê biryarê re dewleta Tirk ev pêkneanî. Ji bo vê jî û ji bo pêkanîna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, mafê hêviyê û gavên qanûnî ji bo Rêber Apo de û di pêkanîna wê de Rola sereke ya jinê ye. Ji ber ku daxwaza jinê ya sereke aştî, demokrasî, wekhevî û azadî ye.

Di derbarê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û rola jinê di pêkanîna Aştî û Civaka Demokratîk de Endama Akademiya Zanista Civakî ya Abdullah Ocelan Rûken Welat ji Rojnemeya me re axivî.



### ‘Banga Rêber Apo ji bo krîza li Rojhilata Navîn çareserî ye’

Rûken Welat diyar kir ku banga Rêber Apo hêviyeke nû ji bo aştî, hevjiyana azad û yekgirtina gelan afirand û wiha anî ziman: “Rêber Apo di di 27’ê Sibata 2025’an de banga “Aştî û Civaka Demokratîk” kir. Bi raghandina vê pêvajoyê re dengvedaneke dîrokî li cîhanê çêbû. Ev banaga Rêber Apo ji bo tevahî gelên li Rojhilata navîn çareseriya krîza siyasî, civakî, mirovî û mezhebî ye. Rêber Apo ev pêvajo ne tenê ji bo azadî û parastina nasnameya gelê Kurd da dest pê kirin, lê belê ji bo tevahî gel, netew û pêkhateyan da dest pê kirin. Ji ber ku niha cîhan û bi taybet Rojhilata navîn di şerekî giran û mezhebî re derbas dibe. Ji bo bidawîkirina vî şerî û avakirina jiyanek bi ewle banga Rêber Apo ya Aştî û civaka demokratîk çareseriyeke guncaw e. Ev sal û nîveke pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk nîşan da ku çareseriya pirsgirêkên heyî bi rêya diyalogê, siyaseta demokratîk û hevfikiriyê gengaz e. Ev pêvajoya ku bi pêşengtiya Rêber Apo dest pê kir, hêviyeke nû ji bo aştî, hevjiyanî û yekîtiya gelan afirand. Em vê pêvajoyê wek qonaxeke dîrokî dibînim ku dikare deriyê çareseriya demokratîk û aştiya mayînde veke. Ger hemû alî bi dilsozî, berpirsiyarî û iradeyeke rast nêzîkbibin, wê ev pêvajo ne tenê bi serkeftî biqede, lê dê bingehek bihêz ji bo avakirina civakeke demokratîk, aştiya mayînde, jiyaneke bi azadî û edalet ava bike.”

### ‘Azadiya Rêber Apo ji bo serkeftina pêvajoyê ne daxwazeke lê pêdiviyeke’

Rûken Welat destnîşan kir ku ji bo serkeftina pêvejoyê pêwîste gavên qanûnî derbarê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de bê avêtin û wiha pê de çû: “Rêber Apo aktorê sereke yê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e. Ji bo vê jî pêwîste ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo gavên qanûnî bên avêtin. Sermûzekervanê vê pêvajoyê Rêber Abdullah Ocelan e, ji bo vê jî ev pêvejo bêyî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo naçe serî. Gavê sereke di pêkanîna vê pêvajoyê de divê ku dewleta Tirk bavêje azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye, ji ber ku bêyî azadiya Rêber Apo serkeftina pêvajoyê ne pêkane.

Ne avêtina gavên qanûnî bi girîngiya rola rêbertî di pêşvebirina vê pêvajoyê de li hev nayê. tevî banga aştî û avakirina civaka demokratîk ku ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan hatine kirin, dewleta Tirk tu gavên qanûnî yên berbiçav neavêtine. Berovajî vê yekê, siyaseta tecrîdê û hiqûqa taybet li ser girtîgeha Îmraliyê berdewam dike. Em bawer dikin ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bihêztir bike, deriyê diyalogê berfirehtir bike, baweriyê di nav aliyan de zêdetir bike, şansê serkeftina aştî û çareseriya demokratîk bilindtir bike. Ji ber vê yekê, em vê yekê ne tenê weke daxwazekê dikin, lê weke pêdiviyeke bingehîn ji bo serkeftina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk dinirxînin.”

### ‘Pêkanîna Mafê Hêviyê mercê serkeftinê ye’

Rûken Welat da zanîn ku demeke dirêj di ser Mafê Hêviyê ya Rêber Apo re derbas bû lê dewleta Tirk di vê mijarê de tu gav neavêtine û wiha got: “Her çendî pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk hêviyek mezin ji bo çareseriya demokratîk e, lê heger mafê hêviyê ji bo Rêber Apo bê dayîn wê pêvejo hîn zêdetir berbi aşîtiyê ve biçe. Mafê Hêviyê prensîbeke hiqûqî ya navdewletî ye ku dibêje: Divê ji bo her girtiyekî ku cezayê wan heta hetayê ye, şans û hêviya qanûnî ya serbestberdanê heye.” Lê tevî ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê destnîşan dike ku girtiyek nabe heya dawiya temenê xwe di zindanê de bê girtin, lê dewleta Tirk vê biryarê pêk nayne. Konseya Ewropayê çend caran ji bo Rêber Apo û hemû girtiyan ji bo mafê hêviyê bang li dewleta Tirk dike ku mafê hêviyê ji bo Rêber Apo û hemû girtiyan bi cih bîne, lê dewleta Tirk di vê mijarê de tu gav navêje û guhertinekê çênake.

Parêzerên Rêber Apo di 2003’an de ji bo mafê hêviyê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) dabûn. Piştî serlêdanê di 18’ê Adara 2014’an de DMME’yê biryar da û xwest Tikriyê mafê hêviyê bide Rêber Apo. DMME’ê Tiriyê di vê serlêdanê de mehkûm kiribû. Di ser vê biryarê de ewqase sal derbas bûne, lê hê jî Tirkiyê ev biryar nas nekiriye. Herwiha li gorî zagonên DMME’ê piştî 25 salan mafê hêviyê heye, ev mijareke mirovî ye û hemû girtî piştî 25 salan mafê hêviyê ji wan re heq dikin. Tevî dewleta Tirk endama DMME’ê lê li hember vê yekê zagonên dadgehê binpê dike. Em di wî baweriyê de ne ku beşdarbûna çalak a Rêber Apo dikare vê pêvajoyê bi hêzeke nû pêş bixe, diyalog û baweriyê di nav aliyan de bihêztir bike û şertên guncawtir ji bo aştîya mayînde biafirîne. Lewra ez dibînim ku pêkanîna mafê Hêviyê û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo merca serkeftinê ye.”

### ‘Hêza bingehîn a azadî, demokrasî û aştiyê ya jinê ye’

Endama Akademiya Zanista Civakî ya Abdullah Ocelan Rûken Welat axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Jin bi berxwedanî, têkoşîn û beşdariya xwe di hemû waran de îspat kiriye ku ew hêzeke bingehîn ji bo azadî, demokrasî û aştiyê ye. Ji ber vê yekê, erka jinê îro ew e ku diyalogê bihêztir bike, hişmendiya civakî belav bike, piştgirî bide çareseriya demokratîk û aştîxwaziyê. Ger Rêber Apo di vê pêvajoyê de aktorê sereke be, em dikarin bêjin ku têkoşîna jinan û piştgiriya wan ji bo her gavek a azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêş dixe, dikare hêza pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk zêdetir bike. Ji ber vê yekê, jinê ne tenê wek beşdar, lê yek ji bingehên sereke yên vê pêvajoyê tê dîtin. Bi îradeya xwe, têkoşîna xwe û berpirsiyariya xwe, jin dikare di avakirina civakeke demokratîk û aştiyeke mayînde de roleke dîrokî bilîze.”




---

Ji Ramanên Jin



Bêrîtan Xalid

## Rêwîtiya ber bi ronahiyê ve

Têgehên jin û welat di hişmendiya mirovahiyê de û bi taybetî di çanda Rojhilata Navîn de, her tim wekî du rûyên heman heqîqetê hatine dîtin. Ev her du nirx ne tenê gotinên ji rêzê ne, ew pênasên sereke yên jiyan, nasname û rûmeta civakê ne. Hezkirina jinê di kûrahiya xwe de rûmetdayîna jiyanê ye û ev hest rasterast vediguhere hezkirina welat.Welat xak e; ew cihê ku mirov jê şîn dibe, jê dikişîne û pê têr dibe. Jin jî dayik e; ew çavkaniya pêşîn a jiyanê û berdewamiya nifşan e. Têkiliya navbera jin û welat ji vir dest pê dike. Mirovê ku fêrî hezkirina jinê nebe, nikare wateya rasteqîn a ax û welat jî fêm bike. Her du jî jiyanê diafirînin, diparêzin û mezin dikin. Ji ber vê yekê, kesê ku nirx nede jinê, hezkirina wî ya ji bo welat jî kêm û bêbingeh dimîne. Nivîskar û ramyarên mezin her tim destnîşan kirine ku asta azadiya civakekê bi azadiya jinê tê pîvan. Welatekî ku jin tê de bindest be, her çend sînorên wî serbixwe bin jî, ew welat bi rastî ne azad e. Ji ber ku nifşên nû di bin destê jinê de mezin dibin, gava jin dîl be, zarokên ku ew mezin dike jî bi hişmendiya koletiyê mezin dibin. Hezkirina jinê û rizgarkirina wê ji zincîrên tarî yên civakî, gava yekem a avakirina welatekî azad û serbilind e. Jin parêzvana herî mezin a nasnameya neteweyî ye. Di nav sedsalan de, dema ku welat hatine dagirkirin û her tişt hatiye qedexekirin, ziman, çand, çîrok û kilamên welat di sîngê jinê de hatine parastin. Dayikê zimanê dayikê gihandiye nifşên nû. Ji ber vê yekê, dema mirov ji jinê hez dike û qedrê wê digire, di eslê xwe de çand, dîrok û paşeroja welatê xwe diparêze. Di dîroka nûjen de, her du têgeh hîn zêdetir bûn yek. Îro li ser vê xakê, jin ne tenê di malê de, Di eniyên herî pêş yên têkoşînê de cih digirin. Jinên ku ji bo azadiya welat canê xwe didin, nîşan didin ku parastina welat û rûmeta jinê nayên cuda kirin. Ev berxwedan îspat dike ku hezkirina jinê bixwe re cesaret û welatparêziyeke pîroz tîne. Hezkirina jinê ne tenê hestekî kesane an evîneke asayî ye, ew hişmendiyeke kûr a civakî û siyasî ye. Hêzên parastina jin YPJ’ê mînaka herî berçave ku îro jin pêşenga vê şoreşê ye . YPJ’ê ne tenê hêzek leşkerî ye, lê nasname, rûmet, sîwanê azadiyê û misogeriya jiyana hevpar e. Tunehesibandina YPJ’ê ji bo gel tê wateya tunekirina vîna parastina cewherî. Mirovê ku dilê wî bi hezkirina jinê ava bibe, ew ê welatê xwe jî wekî herî pîroz biparêze. Heta ku jin li welatekî nebe xwedî rûmet û azadiyê, ew welat nikare azadiya rasteqîn bijî. Ji ber vê yekê, parastin û hezkirina jinê, misogeriya herî mezin a paşeroja welat e. Di dawiyê de, hezkirina jinê û hezkirina welat ne du rêyên ji hev cuda ne, Yek rê ne ku ber bi rûmet û azadiyê ve diçe. Çawa ku welat bê ax nabe, jiyan û azadî jî bê jinê nabe. Ew mirovê ku qedrê jinê bigire û ji kûrahiya dilê xwe jê hez bike, ew ê herî zêde nirxê ax, ziman û azadiya welatê xwe jî bizanibe. Welatekî ku jin tê de serbilind û azad be, pêşeroja wî welatî her tim ronî û geş e.

---



# Li Îranê kirîza avê

Kirîza peydakirina avê li Îranê ne tenê hişyariyeke jîngehî yan jî zehmetiyeke demsalî ye; Lê ew gihaştiye qonaxekê ku bandorê li ser jiyana bi milyonan mirovan dike. Ev yek jî dibe ku xeteriyeke mezin û karîseteke mirovî bi xwe re bîne.

**Navenda Nûçeyan**

Aloziya avê li Îranê ji dijwariyên xwezayî derbas kiriye da ku bibe karîseteke mirovahî, jîngehî û aborî. Kirîza avê ji kêmbûna baranê û derketina hişkesaliyê destpê kir, lê di koka xwe ya kur û wêranker di siyaseta çewt a di rêvebirina avê de ye. Di heman demê de avakirina bendavên bêserûber, xerckirina zêde ya çavkaniyên bierd herwiha pêşveçûna nehevseng a pîşesaziyên ku av lê zêde tê xerckirin, digel nebûna plansaziyek domdar, ev sedem hemû bûne sedema krîza avê ya Îranê. Ji ber vê yekê, ev krîz zêdetir di encama biryar û polîtîkayên ku çavkaniyên avê yên welêt gihandine ber hilweşînê ye, ne ku ji kêmbûna çavkaniyên xwezayî. Wesîleyên raghandinê û pisporên girêdayî hikumeta Îranî jî nema vê kirîzê wekî “Kirîzke demkî” an jî di encama kêmbûna baranê de ye bi nav dikin, lê belê wekî nîşaneke li ser nehevsengiya kur di sîstema dabînkirin û xerckirina avê li îranê ye. Li gorî bîlançoyên fermî nêzî 35 milyon welatiyên Îranê astengiyê ji kêmbûna avê dikşînin herwiha 11 parêzgeh di asta barîna baranê de kêmaniyê dikşîne ku di bin asta asayî de ye.



### Koçberiya bi zorê ji ber kêmbûna avê

Kirîza avê li Îranê gihaştiye naveresta mezntirîn navendên welêt. Li gorî raporên medyayî di dawiya Nîsana 2026’an de, li gorî sala borî, kêmasiya 90 milyon metrekupî ya rezervên pênc bendavên li Tehranê kêm bûye. Herwiha hat eşkere kirin ku ziwabûna ku di sala 2025’an de çêbû jiyana bi milyonan kesan têk bir û li gelek herêmên Îranê bi taybet beşên navîn û başûrê welêt kêmbûneke dem dirêj a avê dîtin, di heman demê ji ber ziwabûna bîr û çeman cotkaran nikarîn zeviyên xwe biçnin. Ev rewşa bi aloz ne tenê jiyana gundan wêrankir lê belê bû sedema koçberiyek berfirek ber bi bajaran ve, ku bi vê yekê zexte mezin li ser binesaziyê kir. Yek ji encamên civakî yên kirîza avê koçberiya berfireh ji gundan ber bi bajaran ve bû. Cotkaran neçar man ku dev ji erdên xwe berdin ji ber ziwabûna bîr û çemên li parêzgehên wekî Xozistan, Sîstan, Beloşîstan û Faris. Ev koçberiyên bi darê zorê, ku pir caran li derdora bajarên mezin ên wekî Tehran, Meşhed û Îsfahanê diqedin, bûne sedema berfirehbûna civakên paşguhkirî û zêdebûna xizaniyê, ev kes ji gîhaştina xizmetên bingehîn ên mîna ava vexwarina paqij bê parin herwiha ji şert û mercên jiyanê yên ne mirovahî zehmetiyan dikşînin. Ji bo birêvebirina van koçberiya hikumetê tu bernameyek pêşkêş nekir, lê belê li şûna wê xwepêşandanê wan ditepisîne.

### Windabûna golên avê

Nexşeya çavkaniyên avê a Îranê meznahiya hilwişîna ku gihaştiye jîngeha xwezayî li welêt eşkere kiriye, gelek golên avê û çem şiyana xwe ya berdewamiyê winda kirine, herêmên berfireh ên zozanan veguhirîne herêmên hişk di heman demê de mîqdara ava ku li pişt bendavan tê hilanîn gihîştiye astên bêhempa. Wekî Gola Urmiye mezntirîn gola li Rojhilata Navbîne û dikeve li bakur-başûrê Îranê, Rûbera wê nêzî 5 hezar û 200 kîlomeçargoşeyî ye û yek ji girîngtirîn ekosîstemên li herêmê ye, lê ji ber veguherîna ava çeman bo wê, avakirina bendavan û zêdebûna xerckirina avê ji bo çandiniyê bi salan, bûne sedema kêmbûneke mezin do rûbera wê de. Wêneyên herî dawî yên NASA’yê jî nîşan didin ku ev gewhera şîn a li bakurê rojavayê Îranê bi tevahî winda bûye û di wêneyên hewayî de tu şopa wê nayê dîtin. Ligel Urmiyê, duyemîn gola mezin li parêzgeha Farisê ya Îranê “Gola Bextekan” zehmetiyek mezin di kêmbûna asta avê de dikşîne. Ev cih yek ji dewlemndtirîn cihên biyolojîk e, lê ji ber avakirina bendavên “Dorudzan”, “Sivand” û “Mella Sedra li ser şaxên çemên “Kar” û “Sivand” bûye sedema sereke ya ziwabûna wê ye.

Di heman demê de Gola Hamon li parêzgeha Sîstan û Beloşîstam jî zehmetiyan ji ziwabûn û kêmbûna asta avê dikşîne, ev gor xwedî girîngiyeke mezin a borî ji bo gelên herêmê ye, ji ber ku ew xwe dispêrin masîgirtin û çanidniyê li hawîrdora wê. Herwiha Deryaya Qezwîn jî dest bi kêmbûna avê bûye, di 20 salên dawî de asta ava wê bi qasî du metreyan kêm bûye.

### Rewşa çeman jî ne dûrî golên avê ye

Rewşa Çeman li Îranê ne baştir e, Karun çemê herî dirêj li Îranê ziwa bûye, herwiha “Sefidrud” duyemîn çemê herî dirêj li parêzgeha Gîlanê jî ber bi ziwabûnê ve diçe, ku zêdetirî 170 hezar hektar ji zeviyên Birincê av dida. Di heman demê de wêneyên masiyên hişkbûyî li ser çemê “Kerxe” sêyemîn çemê mezin li Îranê, belab bibû. Di dîrokê de yekem car çemê “Dêzê”bi temamî ziwa bûye. Herwiha çemên “Kaşkan” ên Loristanê, Çalûs, Ars û Hirmendê ku wekî Çemê Hov tê naskirin, ziwa bûn.

### Bendavên bê av

Yek ji aliyên krîza giran a avê wêrankirina zozan û ekosîstemên avî ye ku di hevsengiya ekolojîk de roleke girîng dilîzin. Li gorî raporên medyayî zaozan ziwabûne wekî zozana “El-Ezîm” li Xozistanê û “Kavukhuni” li Esfehanê ku berê ji bo nebat û ajalên cihêreng cihên bi ewle bûn, lê avakirina zêde ya bendavan û veguhestina çeman ji hêla hikumetê wê kiriye erdên hişk.

Rêze bendavên li ser çemê “Zayandeh Rud” ku ji bo xizmeta projeyên pîşesazî û çandniyê hartin avakirin, bûne sedema ziwabûna “Kawkhuni” û toza ku jê derdikeve gefê li tenduristiya gelê herêmê dike. Rewşa bendavan beşek din e di çîroka trajîdîk a kêmbûna avê li Îranê de ye. Ava bendavên Îranê bi rêjeyek sê qat ji navînîya cîhanê zêdetir winda dibin. Ajansên fermî ragihandine ku ji sedî 64 bendavên welêt vala ne û nirxandinek li ser rezervên avê nîşan dide ku bendavên li parêzgehên Tehran, Xurasan Rezewî, Qum, Azerbaycana Rojava, Sîstan û Belûşistan, Hormozgan, Gulistan, Xorasana Başûr, Zencan, Kerman, Faris û Merkezî di rewşek xirab de ne.

Ava ku di bendavan de tê hilanîn ji sala par ve ji sedî 25 kêmtir e. Di 19’ê Îlona 2025’an de, Bendava “Emîr Kebîr” tenê 30 milyon metrekupî digirt, ku rêjeya tijîbûnê ji sedî 17 temsîl dike, li gorî sala borî ji sedî 73 kêm bûye. Bendava Lar, bi 24 milyon metrekup e, tenê ji sedî 3 tijî bû, ku ji sala borî ji sedî 43 kêm bûye.

Ji hemû parêzgehan, Hormozgan herî zêde bandor bû, asta ava bendavên Şamîl û Niyan li gorî sala borî ji sedç 98 kêm bû, ev yek jî rewşa wan kir a herî xirab. Asta ava bendava ”Îstîqlal” a li heman parêzgehê jî ji sedî 76 kêm bû.

### Daketina erdê û bandora wê li ser binesaziyê

Di sala 2024’an de lêkolînekê eşkere kir ku bikaranîna zêde ya ava binerdê bû sedema daketineke berfireh a erdê, rêjeya daketinê li hin herêma ji 10 santîmetreyan bi awayekî salan e, derbas kiriye. Di heman demê de ji sedî 3, 5 ji erda îranê jê bandor bûye, ev yek ji rêjeyên herî bilind di cîhanê de ye. Ev diyarde lawaziya nbinesaziyan wekî balafirgehan û rêyan zêde kiriye.

Herwiha wesîleyên raghandina hikumetê diyar kirine ku 30 parêzgehên Îranê li hemberî daketineke erdê ne di encama zêdebûna bikaranîna çînên binerd. Wekî din jî pisporên enerjiyê destnîşan dikin ku zêdetirî ji sedî 60 dabînkirinên avê li welêt ji çavkaniyê bierd tê, wiha rêjeya rêjeya derxistinê sê qat ji rêjeya tijîkirina xwezayî zêdetir e.

### Kêmbûna ava binerdê

Di deh salên dawî de li hember kêmbûna çavkaniyê sererdê, ava binerdê xeta parastinê ya dawî bû, lê xwesipartina zêde ya li ser gihaşt kêmbûneke xeter ya dewlemendiya xwzayî, rêjeya derxistina ava binerdê ji nêzî 130 milyar metrekup gihaşt nêzî 160 milyar metrekupî, di çarçoveya berfirehbûna çandî û pîşesazî ku çavkaniyên berdets li ber çavan negirtine.

Di vê çarçoveyê de pispor tekez dikin ku pirsgirêk tenê ne di rêjeya bikaranînê ye, lê di rastiya belavkirina avê û bikaranîna wê ye, ji ber ku sektora çandiniyê zêdetirî ji serî 90 ji çavkaniyê avê xerc dike, her çiqas rêjeyek mezin ji vê çalakiyê bi rêbazên avdanê yên kevneşopî ve girêdayî be jî, ku dibe sedema xerckirina mîqdarên mezin ên avê.

### Hiliwşîna çanidiniyê û nebûna ewlehiya xwarinê

Di encama kirîza avê de rêyên jiyana bi milyonan cotkarên Îranî bi awayekî rasterast wêranbûye herwiha gefê li ewlehiya xurekê ya welat dike. Li gorî raporan li geleh herêman ji ber berfirehbûna çarçoveya ziwabûnê di sala 2025’an de bû sedema kêmbûna hilberîna çandiniyê heya sifrê.

Ev rewş bi taybetî li herêmên mîna Xozistanê, ku berê wekî “Rezerva nan a Îranê” dihat nasîn, karesatbar bû. Ji ber kêmbûna avê, cotkar nikarîn erdên xwe biçînin û bi deynên mezin û xizaniyê re rû bi rû man. Kêmbûna hilberîna çandiniyê ne tenê bû sedema bilindbûna buhayên xwarinê, lê di heman demê de Îran veguherand welatekî sereke yê hawirdekirina genim.

### Gefên li ser tenduristiya giştî û belavbûna nexweşiyan

Nebûna ava paqij bandorên xirab li ser tenduristiya giştî kiriye û metirsiya belavbûna nexweşiyan zêde kiriye. Raporên medyayê bal kişandine li ser pirsgirêkên tenduristiyê yên li Xozistanê, ku ji ber nebûna ava bi ewle niştecihan neçar mane ku çavkaniyên qirêj bikar bînin. Ev rewş bûye sedema zêdebûna rewşên zikçûyîn û enfeksiyonên meîdeyê.

Li bakur-rojavayê welêt, beşek mezin ji Gola Urmiyê, ku berê golek xweşik bû, veguheriye deşteke şor. Perçeyên xwê yên ji vê golê derdikevin û dikarin bi hezaran kîlometreyan biçin û bigihîjin heta bakurê rojhilatê welêt. Li gorî daneyên berdest û lêkolînên ku bi salan berê ji hêla pisporên jîngehê yên Rojavayî ve hatine kirin, ev perçe dikarin bibin sedema nexweşiyên nefes, dil, damaran û gurçikan herwiha nexweşiyên pergala parastinê.

Bandorên vê diyardeyê ne tenê bi parêzgehên Azerbaycan, Kurdistan û Zencanê ve sînordar in, lê li welatên cîran jî belav dibin. Lêkolînên ku ji hêla Zanîngeha Zanistên Bijîşkî ya Tebrîzê ve hatine kirin nîşan didin ku hin ji van bandorên tenduristiyê dest pê kirine. Di nava gel de rêzek nexweşiyên çerm û tansiyona bilind derketine holê, ku di nav xetereyên bi ziwabûna golê ve girêdayî ne.

# Zagona Çarçoveyî: Rêber Abdullah Ocalan çawa qonaxa nû dixwîne?

**Cemîl Xoce**

Daxuyaniyên dawî yên Rêber Abdullah Ocalan ne tenê wekî daxuyaniyeke siyasî ya asayî tên dîtin. Ew nêrîneke nû ji bo qonaxa pêş de pêşkêş dike. Bingehê vê nêrînê derbasbûna ji qonaxa nakokiyê bo qonaxa qanûn û siyasetê ye. Peyama sereke ya van daxuyaniyan ew e ku aştiya mayînde nikare tenê bi rawestandina çekan pêk were, lê pêdivî bi çarçoveyeke qanûnî heye ku mafan misoger bike û têkiliya di navbera pêkhateyên civakê de bi rêxistin bike. Ev nêrîn berdewamiyeke ramanên ku Rêber Abdullah Ocalan di nav salên dirêj de li ser demokrasî, jiyana hevpar û rêvebirina cihêrengiyê bi rêya diyalog û qanûnê bal kişandibû ser.

Têgeha "çarçoveya qanûnî" di vê daxuyaniyê de cihekî bingehîn digire. Ew ne qala qanûneke asayî dike, lê qala bingeh û rêgeza siyasî û qanûnî ya qonaxa nû dike. Li gorî wî, her pêvajoya aştiyê ku tenê li ser lihevhatinên siyasî yên demkî were avakirin, lawaz e. Ji ber ku hikûmet û şertên siyasî dikarin biguherin. Lê gava ku lihevhatin veguhere qanûn û sazgehên mayînde, ew dikare berdewam bibe.

Li gorî vê, ew dibêje ku çareserî nikare tenê ewlehî û leşkerî be. Ewlehî dikare nakokiyê rawestîne, lê sedemên ku bûne sedema nakokiyê çareser nake. Lê qanûna dadperwerane dikare nakokiyên siyasî veguherîne nîqaşeke demokratîk di hundirê dezgehan de. Ji ber vê yekê, Rêber Abdullah Ocalan qanûnê wekî şertê bingehîn ji bo avakirina baweriyê di navbera dewlet û civakê de dibîne.

Ev raman bi têgeha civaka demokratîk a ku di nivîs û manîfestoyên wî de hatiye pêşkêşkirin re girêdayî ye. Li gorî wî, demokrasî tenê hebûna hilbijartinan nîne, lê her wiha nasîna cihêrengiyê, parastina mafan û misogerkirina beşdariya hemû pêkhateyan di jiyana siyasî de ye. Ji ber vê yekê, qanûn di nêrîna wî de divê nebe amûreke serdestiyê, lê bibe rêyek ji bo wekhevî û dadperweriyê.

Yek ji xalên girîng ên daxuyaniyê axaftina wî ya li ser ku Kurd û Tirkan di "qonaxên dîrokî yên girîng ên Anatolyayê de ji hev nehatine veqetandin" e. Ev gotin tenê vegera li dîrokê nîne, lê wateyeke siyasî û dîrokî ya kûr heye. Ew dixwaze nîşan bide ku têkiliya di navbera her du gelan de her tim ne li ser şer bûye, lê di dîrokê de demên dirêj ên hevkarî û hevparî jî hebûne.

Bi van "qonaxên dîrokî yên girîng" re ew qala demên mezin dike ku Anatolya di wan de guhertinên mezin jiyaye. Ji serdema Selçûqiyan dest pêkiriye, di serdema Osmaniyan re derbas bûye, heta qonaxa Şerê Rizgariya Neteweyî û damezrandina Komara Tirkiyeyê, Kurd û Tirkan di gelek bûyerên dîrokî yên hevpar de cih girtine. Rêber Absullah Ocalan van qonaxan bi bîr tîne da ku bibêje dîroka hevpar a her du gelan ji dîroka nakokiyê dirêjtir e û dikare bibe bingehê avakirina paşerojeke nû.

Lê vegera li dîrokê nayê wateya ku pirsgirêkên ku paşê qewimîne bên jibîrkirin. Ew dizane ku têkiliya di navbera her du aliyan de piştî damezrandina Komarê ket qonaxeke dijwar. Bi siyasetên înkarkirin û kêmkirina mafên çandî û siyasî yên Kurd re, bawerî lawaz bû û nakokiyeke dirêj derket holê. Ji ber vê yekê, vegera li dîrokê ji bo wî ne hewlek e ji bo vegerandina rabirdûyê, lê lêgerîna bingehekî nû ya jiyana hevpar e.

Ji ber vê yekê Rêber Abdullah Ocalan qala hevkariya Kurdî-Tirkî dike wekî bingehê paşerojê. Armanca wî ne hevkariyeke di navbera partî yan hêzên siyasî yên taybet de ye, lê şîrekeke civakî û dîrokî ye ku li ser nasîna hevdu hatiye avakirin. Ew dibîne ku paşeroja Tirkiyê nikare bi derxistina yek ji her du aliyan were avakirin, lê bi pergaleke ku wekhevî ji bo hemû kesan misoger dike.

Her wiha gotina wî ya li ser "hestiyariyên hevdu" nîşan dide ku ew tevlihevî û dijwariya pirsgirêkê fam dike. Her aliyek tirs û dîtinên xwe hene. Ji ber vê yekê ew dibêje ku çareserî pêdivî bi têgihiştina hevdu heye, ne bi ferzkirina dîtina aliyekî li ser aliyê din. Di vê çarçoveyê de, demokrasî dibe rêyek ji bo hevahengkirina yekîtiya dewletê û mafên pêkhateyên cuda.

Daxwaza wî ya destpêkirina pêvajoya qanûnî û yasayî bi rêya parlamentoyê wateyeke girîng heye. Ev tê wateya ku pirsgirêk ji qada ewlehiyê derbasî qada siyasî dibe. Parlamento di vê nêrînê de cihê ku daxwaz û nakokiyên civakê tên veguhertin bo qanûn û sazgehên mayînde ye. Bi rêya sazgehên demokratîk dikare çareseriyeke aramtir û domdartir were avakirin.

Bi vê yekê têkildar, axaftina wî ya li ser bidawîkirina qonaxa şer û çekan. Ew nabîne ku dawîya pevçûnê tenê bi dev ji hêzê berdanê pêk tê, lê pêdivî bi garantiyên qanûnî û siyasî heye ku rê li ber dubarebûna krîzê bigire. Ji ber vê yekê, aştiya rastîn tenê rawestandina pevçûnê nîne, lê çareserkirina sedemên ku ew afirandine ye.

Têgeha "qanûna pozîtîf" ya ku Rêber Abdullah Ocalan bi kar tîne vê dîtinê nîşan dide. Qanûn divê ne tenê amûreke ji bo ceza û qedexekirinê be, lê divê bibe rêyek ji bo parastina mafan û avakirina baweriyê. Dewleta ku hemû welatiyên xwe wekhev di beramber qanûnê de hîs dike, dikare bêtir aramî û ewlehî ava bike.

Daxuyaniya Rêber Abdullah Ocalan nîşan didin ku ew hewl dide ku ji mantîqa pevçûnê derbasî mantîqa qanûnê û ji dijberiyê derbasî hevkariyê bibe. Ew bang dike ku qonaxeke nû were avakirin ku li ser nasîna hevdu, demokrasî û dadperweriyê ava bibe. Pirsa sereke ew e ku gelo dewlet amade ye ku gavên qanûnî û sazgehî ku aştiyeke mayînde û aram misoger dikin, biavêje.

# Serê hişk û req heta ku li dîwaran neqelibe...

**Volqan Elî**

Piştî lehiya NATO ya li Enqereyê her tişt noqî bêdengiyekê bû. Na, dema em dibêjin bêdengî ne wisa bêdengiyek aram û hêmin bûyî … Bêdengiyek bû ku her kesî got "ka gelo çi encamê ji vê derkeve, gelo bi qasî ku Trump zirtê Erdoğan dayî dê pêşî li Tirkiyê vekin yan na!"

Bi rastî wisa xuya bû ku dewleta Tirk jî gelekî hêvî û bendewariyên xwe li wê civînê girêdaye. Mînak, ev pêvajoya Aştî û Civaka Demokratî ku nêzîkî du salan dibe ji aliyê xwe ve bi temamî li pêşketinên konjukturî girêdabû. Yanî jixwe re difikirî ku gelo ew ê di wê civîna navborî ya NATO'yê de hêzên giregirer ên civînê yan jî Trump çi wezîfe, statû û misyon bide dewleta Tirk? Ya din jî dê NATO di çi astê de destûr û alî karî bide wan da ku gelê Kurd di jenosîdek mezin re derbas bikin û pêvajoyê (Aştî û Civaka Demokratîk) bi dilê xwe bimeşîne yan jî bi şiklekê dawî lê bîne.

Dewleta Tirk û Erdoğan ji ber vê yekê wisa lê kir ku hemû welatî (di serî de li Enqereyê) bê zar kirin. Destpêkê wekî ku înqilabeke leşkerî li dar ketibe li gelek metropolên Tirkiye meş û civîn qedexe kirin yan jî tengnefes kirin. Bi taybetî li bajarê Enqereyê hemû gemar û gelaşa xwe rakirin, çal û kortal dagirtin, parq û bexçeyên lê vehesînê ji bo beza serê sibê ya 'ey Makron' ji gel re qedexe kirin. Hin kes û grûbên serê xwe neçemandibûn girtin.

Bi qasî ku di ragihandinê de deng vedaye Trump têra Erdoğan û dewleta Tirk zirtê wan da. Di gelek nîqaş û hevdîtinan de timî, pêşî Trump û paşê jî sekreterê NATO'yê Rûte pîşesaziya şer a dewleta Tirk werimandin. Dawiya dawî dema xelasbûna wê civîna navborî de Erdoğan wekî ku kalikê Trump yên qowboy dilê xwe bibijînînê, destê xwe avêt rextê xwe û darmanceyek da her nûnerê/a dewletên beşdarî civînê bûne.

Di encamê de çi bû? Bi qasî ku di ragihandina wan de her kesî şopandiye, dewleta Tirk, derdora Erdoğan jê kêfxweş bûn. Ji ber çi? Trump, soza F-35, rakirina cezayên Caatsa'yê, firotina motorên KAAN (ku Erdoğan û ragihandina wî ji wan re digot, "balafirên me yên millî û xwecihî " û pê fortên xwe didan) dabû.

Mixabin ji beriya vê civîna bi sergêjahî, dewleta Tirk bi van hêviyan, pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk dereng xist û destê xwe giran kiribû. Hema piştî wê, dest pê kir serxweşiya wan derbas bibe. Çima? Sedem: Trump çawa xwe gihand Koşka Spî daxuyanî da ku wî hê jî ji bo F-35 bi temamî biryar nedaye û dî sa dewletên Yekîtiya Ewrûpayê jî daxuyanî dan ku dewleta Tirk di dagirkeriya xwe ya li ser Qibrisê di 1974'an de li ser Rûmên vê cizîrê tecawiz û şidet meşandiye. Wisa çend delîlên ku xwe dane der nîşan dane ku xewnên dewleta Tirk hemî jî xav in û ne ji ti re ne. Ji ber wê yekê ye ku kêliya ku sere wê li dar û beran qelibî, wisa xuyaye ku kêmekî bi xwe hesî. Mirov rast bêje ev tiştê ku me gotine hin texmîn û pêşdîtin in dibe ku sedemên pir cudatir û girantir hebin. Eger wisa be, yek dê bibêji 'tu çawa gihaştî vê encamê'? Eger pirseke wisa bi xwîneran re çêbibe, heqê wan e. Dibe ku wekî mentiqeke çors xuya be. Yan jî dêlîlên me kêm bin ku Trump û saziya Nato'yê ber dilê dewleta Tirk xweş kiriye û fortên wê dane: Di vê de armanca wan ew bû ku biryara şerê dijî Îranê li Enqereyê bigirin û wisa jî kirin. Ne girîng e ku di demên pêş de Tirkiye di çi astê de bikeve nav şerê li dijî Îranê. Dîsa biryara saxlem a piştgiriya Ûkraynayê li beramberê Rûsyayê di vê rûniştina navborî de hate wergirtin. Yanî helwesta li lijî Îran û Rûsyayê di vê pêvajoyê de misoger bû.

Bi qasî ku ji kêmdelîlên zeyif tê fêmkirin, Trumpî , Rûtê sekreterê NATO da ku karibin qaşo sekneke yekgirtî ya endamên NATO'yê li dijî Îran û Rûsyayê nîşan bidin, biryara şerê Îranê li Enqereyê bistînin -ev girîng e- zebeş û pêtix dane bin çengê Erdoğan.

Dema ku ev rewş ji aliyê dewleta Tirk ve kêmekî hate fêmkirin, hema bi lez û bez li pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk -ew bi xwe jê re dibêjin qaşo 'Tirkiyeya Bê Teror'- vegerîn, hevdîtina heyeta Partiya Demê ku wan bi xwe wekî 23'ê Tîrmehê diyar kiribûn xistin roja 20'ê Tîrmehê. Xuyaye ku naxwazin bi temamî bi benikê ku Trump li pişta wan girêdaye hêviya xwe bînin û dakevin nav dojeha şerê Rojhilata Navîn û Rûsyayê. Ev yeka nayê maneyê ku bi temamî niyeta wan heye tiştê ku hêzên demokratîk ji pêvajoyê fêm dikin bixin meriyetê. Na! Nîqaşa li ser vê, mijareke cuda ye. Tenê ya ku di van çend rojên dawî de qewmiye, wê gotina Kurdî pişrast dike, dibeje serê yekî /ê ewqas hişk û req e heta ku li dîwar û tehtan neqelibe bi xwe nahese!'

Dibe ku demeke bi qasî çend rojan be lê eger nîqaşên pêvajoyê bi erênî encam bibe, ne dûr e ku bandora wê bi sed salan bidomê!



# Xeta Iraq-Sûriyê-DYA'yê; Zêdeyî 600 hezar ton sotemenî hatiye hinardekirin

**Xeta ji bo hinardekirina petrola Iraqî bi rêya Sûriyê ber bi DYA'yê ve, ji destpêka Nîsanê ve ketiye pratîkê û heya dawiya Hizêranê zêdeyî 600 hezar ton petrola xav hatiye hinardekirin.**

**Navenda Nûçeyan**

Di nav çend mehan de rêya tankerên Îraqî yên ku ji axa Sûriyê ber bi Banyasê li Perava Sûriyê ve diçûn, veguherî korîdoreke bejahî ya xeta aborî ya birêkûpêk, armanc jê ew e ku bi sedan hezar tonên berhemên petrolê yên Iraqê ji Deryaya Spî heta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê were şandin. Ev rê di destpêkê de weke çareseriyek demkî bû ku ji ber kirîza Tengava Hurmizê hatibû destpêkirin, lê niha bûye rêyek birêkûpêk.

Di pêşveçûna herî dawî de Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê cara yekem dest bi hawirdekirina barên sotemeniyê ya Îraqê kir, ev yek jî bi rêya bejahî di nav Sûriyê re tê veguhestin û ji Banyasê ji nû ve tê rêkirin.

Hîna qaseya petrola ku derbasî Sûriyê dibe li gorî hinardekirina mezin a petrolê ya Iraqê sînordar dimînin jî, rêya Banyasê ji pîvana xwe ya heyî girîngtir dibe. Ev di demekê de tê ku kirîza Tengava Hurmizê hilberînerên petrolê yên Kendavê neçar kiriye ku rêyên alternatîf bigerin ku ji tengasiyên deryayî derbas bibin, di heman demê de Iraq ji aliyê xwe ve li şûna çareseriyên demkî ew li çareseriyên mayînde digere da ku rêyên hinardekirina enerjiyê cûrbecûr bike.



**Qaseya petrola ku ber bi DYA'yê ve çûye:**

Di destpêka Nîsanê de, karwana yekem a petrola Iraqê bi rêya deriyê sînor ê Tanfê re derbasî axa Sûriyê bû paşê ber bi depoyên parzûngeha Baniasê ve çû da ku ji bo barkirina li ser tankeran û hinardekirina wê bo bazarên cîhanî amade be.

Karwan ji 299 tankeran pêkdihat, di heman demê de Kompanya Petrolê ya Sûriyê ragihand ku armanca peymanê ew e ku mehane herî kêm bi qasî 500 hezar ton petrola Îraqê bigihîne.

Di 15'ê Nîsanê de Baniasê dest bi barkirina yekem a petrolê, ev pêvajo bi rêya kompanya ASAHI PRINCESS, bi barekî 85 hezar ton petrola Îraqê kir û çend rojan dom kir.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku heta Hizîrana 2026'an, Îraqê di mehekê de zêdetirî 600 hezar ton sotemenî bi rêya Banyasê hinarde kiriye, di heman demê de tevahî hinardekirina sotemeniyê ji Rojhilata Navîn gihîştiye nêzîkî 2.4 milyon ton. Ev tê vê wateyê ku qebareya petrola Îraqê ya bi rêya korîdora Sûriyê hatiye hinardekirin, bi qasî çaryeka hinardekirina sotemeniya herêmê ya wê mehê ye.

Cîgirê Serokê Kompanya Petrolê ya Sûriyê ji bo Karûbarên Veguhastin û Depokirinê, Ehmed Qubbacî, eşkere kir ku rojane di navbera 900 û 1,000 tankerên Îraqî de dikevin axa Sûriyê û piştî ku tesîsên wergirtin û depokirinê li Banyas, Hums, T4 û Nasiriye hatin amadekirin, hejmara tankerên ku dihatin valakirin bi qasî hejmara diketin Sûriyê, bû.

Wekî din êdî cihên gihîştinê bi welatên Deryaya Spî ve sînordar nebûn. Di navbera Hizîran û Tîrmehê de, sê tanker ji Banyasê derketin, bi qasî 1.42 milyon bermîl sotemeniya Îraqê hildigirtin û ber bi Dewletên Yekbûyî ve diçûn. Tankera On Passion di 17'ê Hezîranê de ji Baniasê derket, bi qasî 716,600 bermîl petrol hilgirtibû. Nêzîkî 487 hezar û 600 bermîlî li Bahamayan daxist, mayî jî ji bo daxistina li Teksasê hat plankirin.

Tankera Nissos Christina jî nêzîkî 288 hezar û 500 bermîl bar kir, di heman demê de tankera Green Warrior jî nêzîkî 414 hezar û 400 bermîl hilgirt, her du jî ji bo bazara Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bûn. Ev barkirin yekem derxisitna petrola Iraqê ji Sûriyê bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê temsîl dike.

**Girîngiya rêya Îraq-Sûriye-DYA'yê wê ya herêmî**

Girîngiya vê pêşketinê ne tenê di ketina petrola Iraqê bo bazara Amerîkayê de ye. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kirrûbirekî demdirêj ê berhemên enerjiyê yên Îraqê ye. Daneyên herî dawî yên salane yên ji Rêveberiya Agahdariya Enerjiyê ya Amerîkayê (EIA) nîşan didin ku di sala 2025an de, Amerîkayê bi navînî rojane 249 hezar bermîl petrola xav û berhemên petrolê ji Îraqê îtxal kiriye, di nav de 179 hezar bermîl petrola xav û rojane 70,000 bermîl berhemên din.

Di heman salê de Amerîkayê bi qasî 490 hezar bermîl petrola xav ji welatên Kendavê û Rojhilata Navîn hawirde kiriye û ev yek ji sedî 8'ê hawirdekirin giştî ya petrola xav a 6.2 milyon bermîl rojane temsîl dike.

Girîngiya rast di wê rastiyê de ye ku ev hawirdekirin niha ji bo cara yekem, rêyek cûda digirin, Îraqê bi rêya Banyasê bi peravên Sûriyeyê ve girêdide, berî ku ji Deryaya Spî û Atlantîkê derbasî Dewletên Yekbûyî bibe. Ev rê di bin zexta kirîza Tengava Hurmizê de bi lez derket holê û ev yek bû sedem ku Îraq lêgerîna xwe ya ji bo dergehên alternatîf ên hinardekirinê bilezîne da ku girêdayîbûna xwe ya bi hinardekirina bi rêya Kendava Erebî kêm bike. Berî şerê bi Îranê re, rojane nêzîkî 20 milyon bermîl petrol ji Tengava Hurmuzê derbas dibû. Lê belê Ajansa Enerjiyê ya Navneteweyî (IEA) radigihîne ku herikîn di Adar, Nîsan û Gulanê de bi navînî daketiye 2.7 milyon bermîl di rojê de. IEA kirîza Tengava Hurmizê wekî têkçûna herî mezin a dabînkirina petrolê di dîrokê de bi nav dike û windahiyên berhevkirî yên hilberînerên Rojhilata Navîn ji 1.3 milyar bermîlan derbas bûne.

Wekî din, di lûtkeya kirîzê de di destpêka Nîsanê de, petrola xav a Dated Brent ku pîvanek navneteweyî ya sereke ye, gihîşt asta herî bilind a 144 dolarî ji bo bermîlekê û ji asta beriya şer du qat zêdetir e. Îraq ji ber girêdayîbûna wê ya giran bi bendergehên Besrayê yên li Kendava Farsê di nav wan welatan de bû ku herî zêde bandor lê hatibû kirin.

Berî kirîza Tengava Hurmizê, Îraqê ji Besrayê rojane nêzîkî 3.6 milyon bermîl petrol hinarde dikir. Lê belê, di Adara 2026'an de tevahî hinardekirina petrola xav a Îraqê ji bo tevahiya mehê ji 18 milyon bermîlan derbas nebû, bi navînî nêzîkî 580 hezar bermîl rojane bû. Di encamê de dahata hinardekirinê ji nêzîkî 6.8 milyar dolar di Sibatê de daket dora 1.9 milyar dolarî, di Adarê de ev tê vê wateyê ku Îraqê di mehekê de piraniya gihîştina xwe ya bazarê ya asayî winda kir.

Daneyên S&P Global mezinbûna şokê bêtir nîşan didin ku hilberîna Îraqê di Sibata 2026'an de gihaşt 4.22 milyon bermîl rojane, lê di navbera Adar û Hezîranê de ji ber rêyên hinardekirinê yên alternatîf ên sînorkirî daket kêmtir ji 2 milyon bermîl rojane. Ev yek ji bo siyasetmedarên Îraqî dîtina rêyên alternatîf ên ku Tengava Hurmizê derbas dikin kiriye, bijarteyeke sereke.

# Di heftiyekê de Îsarîlê 17 çalakiyên bejayî li ser axa Sûriyê pêk anîne

**Navenda Nûçeyan**

**Hêzên Îsraîlê rêzeçalakiyên leşkerî li ser xeta sînor li başûrê Sûriyê, berdewam dike. Di nava heftiyekê de artêşa Îsraîlê 17 caran derbasî axa Sûriyê bûye û operasyonên leşkerî pêk anîne.**

Li gorî Rewangeha Mafê Mirovan a Sûriyê, di navbera 17 û 24'ê Tîrmehê de hêzên Îsraîlê 17 çalakiyên bejayî pêk anîn, di nav de avakirina xalên kontrolê û lêgerîna sivîlan û şeş êrîşên hewayî ku tê de firînên giran ên ji hêla balafirên şer, helîkopter û balafirên keşfê ve hebûn.

Her wiha du êrîşên hewayî jî hatin tomarkirin, ku tê de bombe ji dronan hatin avêtin, digel sê bûyerên gulebarana makîneyan û topan ku di encamê de zarokek û ciwanek birîndar bûn û du ciwan hatin girtin.

**Dema bûyeran**

Di 17'ê Tîrmehê de hêzek leşkerî (çar wesayît û buldozerek) ket malên sivîlan li Abdîn li Deraayê. Dewriyeke din ket herêma Bendava Ruweyhîna li Quneytrayê lê piştî demeke kurt vekişiya. Di heman demê de, balafirên şer bi firîna li ser hewza Yermûkê qada hewayî ya Sûriyeyê binpê kirin û dronekê bombeyek li nêzîkî sivîlan li ser rêya Me'ariye-Ebdîn avêt.

Di 18'ê Tîrmehê de dewriyeke Îsraîlî ket gundê Tell Ehmer el-Şerqî, Bendava Kodna û Seyda el-Henût li Quneytrayê. Di heman demê de, du operasyonên hewayî bi balafirên keşfê û helîkopteran li ser Bendava Kodna û deverên ku dirêj dibin heta "Sêgoşeya Mirinê" û derdora el-Kiswah li gundewarê Şamê pêk anîn. Dronekê du bombeyên deng di navbera Ebdîn û el-Erdayê de avêtin.

Di 19'ê Tîrmehê dewriyeyek ket gundê El-Semdaniya el-Şerqiyah xaleke kontrolê ya demkî ava kir



Di 20'ê Tîrmehê de dewriyeyek ji heft wesayîtan pêk dihat ji deriyê Tell Ebû el-Xeyser ber bi Rezaniye û Seyda el-Henût ve ket hundir û ciwanek girt.

Di 21 Tîrmehê de du dewriyên Îsraîlî ji deriyê Tell Ebû el-Xeyser ketin Wadî Reqad û gundê Seyda el-Henût .

Di 22 Tîrmehê de du dewrî derbasî derdora Bendava El-Menterah bûn.

Di 24'ê Tîrmehê de devera di navbera Berîqa û Bir Ecem, Wadî El-Reqad û Tell El-Dera'iyat li rojavayê El-Mu'ellaqa li gundewarê Quneytra hat topbarankirin.

# Zulkif Uçar: Êdî divê Kurd ji deriyê hiqûqê bikevin hundir

Parêzer û Parlamenterê DEM Partiyê yê Wanê Zulkif Uçar diyar kir ku divê biratiya gelê Kurd û Tirk a hezar salan, êdî bi normên demokratîk bibe pergaleke hiqûqî, dewlet lazim e hesabê sedsala xwe ya paş de ma, baş bike û hiqûqa nû li gorî vê amade bike. Statuya Rêber Apo sitûna serkeftina vê pêvajoyê ye, misogerkirina statuyê jî bi statuya siyasî û hiqûqî ya gelê Kurd re hemwate ye.

**Ronahî Sadûn**





Derbarê qanûnên ku di çarçoveya Pêvajoya Aştî Civaka Demokratîk de werin nivîsandin, Parêzer û Parlamenterê DEM Partiyê yê Wanê Zulkif Uçar bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Ev zêdetirî sal û nîv e ku pêvajoya "Aştî û Civaka Demokratîk" ji aliyê Rêber Apo ve hatiye destpêkirin. Ji bo pêvajoyê jî gelek gavên girîng ji aliyê Tevgera Azadiyê û Rêber Apo ve hatin avêtin. Lê dewleta Tirk di aliyê derxistina qanûnan de, dereng gavan davêje, hûn vê rewşa çawa dibînin?**

Wekî ku tê zanîn, pêvajoyên aştî û çareseriyê dikarin li ser bingeha îrade û berpirsyariya du aliyan bi pêş bikevin. Ji destpêka pêvajoyê heta niha, tevahiya raya giştî dizane ku hem Rêber Abdullah Ocalan hem jî PKK'ê gavên gelekî mezin û dîrokî avêtin û berpirsyariyeke mezin girtine ser xwe. Lê mixabin, dewletê wek mixatab, berpirsyariyên xwe neanî cih. Ji ber vê yekê di civakê de têgihîştinên mîna xitimîn, rawestin an jî derengmayîn derketin holê. Lê belê em dikarin bêjin ku Rêber Abdullah Ocalan bi salan e li ser çareseriya demokratîk dixebete û îro ev pêvajo aniye asteke bêveger. Êdî vegera dewletê jî ne mumkin e.

Derengmayîna qanûnan em dikarin li ser du xalan binirxînin:

- Hişmendiya avaker a dewletê: Ev dewlet ji dîroka avakirinê heya niha li ser înkarkirina Kurdan birêve çûye. Îro Rêber Abdullah Ocalan rêya çarçoveyeke hiqûqî ji bo gelê Kurd vedike. Hişmendiya dewletê di navbera vê çarçoveyê û înkarkirina Kurdan de hîn jî nikare biryareke zelal bide. Ji ber ku ev sed sal e hemû tevgera dewletê li ser vê bingehê dimeşe.

- Lêgerîna firsendên din: Ya duyemîn jî ew e ku erkên dewletê yên navxweyî hîn jî li rêyeke din digerin ku Kurdan derveyê hiqûqê bihêlin û bi piştgirîya hêzên din rêyeke din vekin. Lê hem konjonktura Rojhilata Navîn û hem jî ya cîhanî vê rêyê nade dewletê. Dewlet êdî mecbûr e ku vê pirsgirêkê çareser bike. Em hêvîdar in ku di rojên pêşiya me de, pêvajo pêşve biçe û qanûn bên parlementoyê.

**Dewlet heta niha ji bo derxistina qanûnên ku hem Rêber Apo hem jî Tevgera Azadiyê ku jê sûd werbigre, amade nekirine. Hûn wek hiqûqnas vê çawa dinirxînin?**

Weke ku li ser çapemeniyê tê axaftin, amadekariyeke dewletê ya qanûnî heye. Lê heya niha em nizanin ku naveroka wê çi ye. Rêber Abdullah Ocalan pêşniyara xwe ya qanûnî ji dewletê re şandibû. Ev pêşniyar ji 7-8 xalan pêk tê. Ji bo ku hiqûq rola xwe ya çareserkirinê bîne cih, divê hem qanûn dereng nemînin, hem bi danûstandinan pêk werin, hem jî naveroka wan zelal be û ji rêveberan heya gerîlayan her kesî bihewîne. Di pêvajoya çareseriyê de her ku wext derbas dibe, metirsî jî zêde dibin. Ji ber vê yekê, lazim e ku di wextekî nêzîk de qanûnên pêvajoyê bên amadekirin û ji parlamentoyê derbas bin.

**Rêber Apo di hevdîtina xwe ya bi DEM Partiyê re careke din bal dikêşe ser"Hiqûqa negatîf û hiqûqa pozîtîf", ji bo pêkanîna hiqûqa pozîtîf lazim e çi gav bên avêtin?**

Rêber Abdullah Ocalan bi vê pêvajoyê re, ji bo Kurdan çarçoveyeke hiqûqî digere. Heya niha Kurd ji derveyê hiqûqê man û bi tu hawî ewlehiya wan tune bû. Êdî divê Kurd jî, ji deriyê hiqûqê bikevin hundir. Li ser vê esasê, hiqûqa pozîtîf rêyeke nû vedike. Divê biratiya gelê Kurd û Tirk ya hezar salan, êdî bi normên demokratîk bibe pergaleke hiqûqî. Dewlet lazim e hesabê sedsala xwe ya paş de ma, baş bike û hiqûqa nû li gorî vê amade bike. Rêber Abdullah Ocalan bi nasandina hiqûqa pozîtîf, behsa hiqûqeke wisa dike ku tê de normên înkar û asîmîlasyonê cih nebînin. Di vê çarçoveyê de, astengiyên li pêşiya civaka demokratîk jî divê bên rakirin. Rêber Abdullah Ocalan ji derveyê serweriya dewletan dixwaze civakeke serbixwe ava bike. Ev yek xaleke navendî ye. Hiqûqa pozîtîf divê şertên vê perspektîfê jî bîne cih ku civak bi awayekî demokratîk xwe rêxistin bike. Bi kurtasî em dikarin bêjin: Hiqûqa pozîtîf hem ji bo tevahiya civakê derfetên xwerêxistinkirinê digere, hem jî bi taybetî ji bo gelê Kurd derfetên statuyê digere.

**Rêveberiya tevgerê jî di daxuyaniya xwe de bal kişand li ser "Qanûna ku rêbertî heta bi şervana her kesî tevlî siyaseta demokratîk dike" divê bê derxistin. kir. Di vê daxuyaniyê de diyar dibe ku di qanûnên hatine derxistin de Rêber Apo cih nagre, sedem çi ye?**

Hê ji me re xebateke dewletê ya qanûnî nehatiye. Ji ber vê em nikarin bêjin teqez Rêber Abdullah Ocalan derveyê qanûnê hiştine. Statuya Rêber Abdullah Ocalan sitûna serkeftina vê pêvajoyê ye. Dewlet mecbûr e ku statuya Rêber Abdullah Ocalan nas bike û bi rêya hiqûqê misoger bike. Em texmîn dikin ku dewlet jî vê yekê baş dizane ku bêyî statuya Rêber Abdullah Ocalan pirsgirêk nayên çareser kirin. Statu, rewşa ku Rêber Abdullah Ocalan bikaribe bi awayekî azad bixebite û peywendiyê deyne îfade dike. Her kes dizane ku statuya Rêber Abdullah Ocalan di gelek wateyên cihêreng de xwedî roleke avaker e. Berî her tiştî, ji bo ku pêvajoya aştiyê pêş bikeve û ya girîngtir jî domdar bibe, divê Rêber Abdullah Ocalan ê ku mîmarê aştiyê ye, projeya xwe ya aştiyê û pêşbîniya xwe ya siyasî ji hemû civakê re ragihîne. Em dikarin vê bi rehetî îfade bikin: Rêber Abdullah Ocalan ê ku bi salan e ji bo avakirina bingehê teorîk a siyaseta civaka demokratîk dixebite û li ser vê xalê kûr dibe, gelek fikrên wî yên rêveker hene ku ji civakê re ragihîne. Di vê wateyê de misogerkirina statuyê û pêşxistina derfetên peywendiyê, dê herî zêde ji bo feydeya tevahiya civaka Tirkiyê encam derxe. Bi vê aliyê xwe ve statu yek ji mercên pêşîn e ji bo destpêkirina veguhertina civakî ye. Ya duyemîn, misogerkirina statuyê bi statuya siyasî û hiqûqî ya gelê Kurd re hemwate ye. Ji bo ku gelê Kurd jî wekî neteweyekê hebûna xwe misoger bike û mercên azadiya xwe biafirîne, projeyeke Rêber Abdullah Ocalan heye ku bi mercên reel-siyasî re pir hevaheng e. Bi rêya statuyê ev proje jî dê derfetên berfireh bibîne.

**Ji bo ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk bê, lazim e çi bê kirin?**

Rêber Abdullah Ocalan azadiya xwe jî ya civak û hemû kesayetan jî di azadî, demokrasî û rêxistina civakê de dibîne. Yanî civaka demokratîk weke jêderka hemû azadiyan dibîne. Ji ber vê yekê beriya her tiştî divê li her derî civak bi perspektîfa Rêber Abdullah Ocalan xwe rêxistin bike. Encax bi vî şeklî civak dikarin dewletan biguherînin. Di heman demê de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan divê çar perçê Kurdistanê û her deverê cîhanê bênavber xebat bên meşandin. Ev her du xal berpirsyariyên civakê ne. Ji aliyê din, berpirsyariyên dewletê hene ku ev jî bi statuya Rêber Abdullah Ocalan ve girêdayî ye. Divê dewlet di qanûnan de vê mijarê misoger bike.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermend Mîr Perwer; Kanîyek ji awazên qet naçike, û baxçeyek ji wateyên qet na çilmise."

Strana Kurdî beşeke bingehîn a dîroka gelê Kurd e, ew ji bîranîna gund, çiya û jiyana şivantiyê afiriye, û hevrêtiya jiyana rojane kiriye û bûye tomarek devkî ji bo mirovan. Dengbêjan bi dengên xwe ev mîrate parastin, çîrokên lehengiyê, evîn û sirgûniyê ji nifşekê bo nifşeke din veguhestin, û strana Kurdî kirin amûrek ji bo parastina nasname û zimanê Kurdî li hember siyaseta qedexekirin û tunekirinê.

Bi pêşketina muzîkê re strana kurdî ji folklora gundewarî derbasî strana nûjen bû, reseniya xwe parast û di heman demê de li hember şêwazên nû yên vegotin û derbirînê jî vekirî ma.

Di vê çarçovê de serpêhatiya Mîr Perwer derdikeve pêş, ku ne tenê wek hunerekî bi dengbêjiyê re mijûl bû, lê wek peyameke çandî û neteweyî , wî hevsengiyek di navbera dilsoziya bi mîrate û vegotina pirsgirêkên gelê xwe re çêkir , lewra dengê wî bû pirek di navbera resenî û nûjeniyê de û ruhê strana Kurdî ya resen di berhemên xwe de bi awayekî berbiçav temsîl kir.

Hunermendê Kurd Mihemed Şêrîn Aydin, ku bi navê hunerî "Mîr Perwer" tê naskirin, di 19ê Kanûna 1993 'an de li navçeya Gumgumê, ya girêdayî bajarê Mûşê li Bakurê Kurdistanê, ji dê û bavekî Kurd (Şêrîn Aydin û Filîz Aydin) hat dinyayê ,ew di malbateke Kurdî ya neteweyî û kedkar de mezin bû; malbatek ku ji heft zarokan pêk dihat, û ew tenê kurê yekane yê malbatê bû di nav şeş xwişkên xwe de, ew di nav hezkirin, dilovanî û lênêrîna malbatê de mezin bû, evê yekê bandorek mezin li ser avakirina kesayetiya wî ya mirovahî û hunerî kir, û girêdana wî bi malbatê re zêdetir bihêz kir.

Malbata wî bi girêdana xwe ya xurt bi nirxên Kurdayatî, û bi peywendiya wan a kûr bi jiyana civakî û çandî ya gundewarî û çiyayî dihat naskirin.

Mîr Perwer xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî li navçeya Gumgumê (Warto), ya girêdayî parêzgeha Mûşê, qedand , ew di nav jîngehekî de mezin bû ku muzîka folklorî û strana Kurdî di jiyana rojane û di bûyerên malbatî û neteweyî de cihê xwe yê taybet girtibû , bi xwe bîra civakî, çîrokên ji nifşan hatine veguhestin û hestek kûr a girêdanê bi welat, gel û nasnameyê re dihewand, ev jî bandoreke mezin li ser guherîn û pêşketina kesayetiya hunerî ya Mîr Perwer kir, û di dilê wî de hezkirina strana Kurdî û mîrata çandî zêdetir kûr kir.

Ji zaroktiya xwe ya zû de, hewesa wî ya ji bo muzîkê hêdî hêdî diyar dibe ,ew bi baldarî guh dide strana kurdî bi zaravayê wê yê herêmî û hewl dide dengên ku di dawetan, şahiyên gelêrî û helkeftên neteweyî de dibihîstin zarve bike ,ev ne tenê hobiyek derbasbûyî bû, lê destpêka têkiliyek giyanî ya kûr bi muzîkê re bû , ku zû zû veguherî bû jêhatiyek xwezayî, û bi derbasbûna salan re hêdî hêdî mezin bû.

Lê şert û mercên jiyanê nehiştin ku xwendina xwe ya zanîngehê bidomîne, ji ber vê yekê berê xwe da muzîkê û ew kir rêya jiyana xwe û qada afirandin û bexşandina hunera xwe, heta ku bû yek ji navdartirîn dengên ciwan di strana kurdî ya hevdem de.

Gava ku Mîr Perwer gihîşt temenê 18 salî, dest bi beşdarbûna çalakiyên hunerî yên piçûk kir, piştre berhemên xwe tomar kir û li ser platformên dîjîtal belav kir, ev yek jî bû sedem ku dengê wî were naskirin û stranên wî bigihîne temaşevanên berfireh li hundir û derveyî Kurdistanê.

Ev hebûna elektronîkî bû xaleke girîng di rêwîtiya wî ya hunerî de; çalakiyên wî yên hunerî bala dezgehên ewlehiyê yên Tirkiyeyê kişandin, û di heman demê de bala kompanya hilberînê a muzîka kurdî " Birûsk Agirî " kişande ser xwe û bi wî re peymanek hunerî îmza kir û albûma wî ya yekem bi navê "Bedengî" belav kir.Piştî ku hebûneke berçav bi dest xist di rêya çend stranên xwe yên tekane (singel).

Ev albûm bû xala veguherîna rastîn di rêwîtiya wî ya hunerî de, di nav wê de, wî şêwazek hevseng pêşkêş kir ku ruhê strana kevneşopî ya Kurdî bi hest û şêwaza nûjen re têkildar kir, di heman demê de, bal kişand ser mijarên hesret, nasname û girêdana mirov bi ax, welat re , bi vê berhemê, ew wek dengekî ciwan derket holê ku di navbera reseniya mîrata kurdî û dîtina muzîkî ya nûjen de hevsengiyek afirandibû, xwe nîşan da,ev yek bû sedem ku cihê xwe di nav nifşê xwe de bihêz bike û bala temaşevan berfireh bikişîne ser xwe.

Ji nav stranên wî yên berfirehî dengvedane , ev in:

- Felek.
- Bajar.
- Germa Mûşê.
- Amed
- Siwaro

Van berheman bûn sedem ku di demeke kurt de navê wî were binavkirin û dengê wî bigihêje dilê beşekî berfireh ji ciwanên Kurd, wan di stranên wî de vegotineke rastîn ji hest, hêvî û xewnên xwe, û her weha ji girêdana wan bi nasname û welatê xwe re dîtin.

Bi firehbûna hebûna wî ya hunerî, zêdebûna beşdarbûna wî di cejnên neteweyî, festîvalên gelêrî û çalakiyên çandî de, û ji ber ku di berhemên xwe de her dem bal dikişand ser nîşan û sembolên neteweyî yên Kurdî, ew gelek caran rastî zext û tengasiya ewlehiyê hat, evê yekê rewşeke dijwar li ser wî ferzkir , û bandoreke berbiçav li ser jiyana wî û rêwîtiya wî ya hunerî hişt.

Piştî çend salan ji peyrewanên ewlehiyê û sînordariyên ku li ser wî hatinbûn sepandin ji ber xebatên wî yên hunerî û çandî, Mîr Perwer neçar ma ,di destpêka sala 2021'an de,ku Bakurê Kurdistanê bihêle û ber bi Fransayê ve here, li wir bi cih bû û dest bi qonaxeke nû ji jiyana xwe kir, û tevlî koma Berxwedan bû , xebata xwe ya hunerî di nav revenda kurdî de berdewam kir,û beşdarî gelek konsert, çalakiyên çandî û festîvalan bû ku ji bo piştgiriya çanda kurdî û vejandina mîrata wê ya hunerî hatibûn lidarxistin.

Ew zewicî bû, du zarokên wî hebûn ,her dem hewl dida ku jiyaneke aram û bi ewle ava bike; ku tê de hevsengiyê bike di navbera malbat, huner û xizmeta çanda Kurdî de ,lê rêwîtiya wî ya hunerî, ku bi hêvî û afirîneri pêş diçû, bi awayekî trajîk û dilşewat bi dawî bû.

Ezmûna hunerî ya Mîr Perwer tenê bi stranên tomarkirî sînordar nema ,wî her weha pirtûkxaneya hunerî ya Kurdî bi dehan vîdeoklîpan dewlemend kir; ku dîtina wî ya hunerî nîşan didan û hevsengiyek di navbera xweşbûna edakirinê , zelaliya raman û kûrbûna peyamê de afirandibû. Wî her dem hewl dida ku berhemên yekgirtî pêşkêş bike; yên ku wêne, peyv û awaz di yek çarçoveyê de dicivînin, bi awayekî ku bibe alîkar ku strana kurdî bigihîne temaşevanên berfireh li hundir û derveyî Kurdistanê.

Ji nav berhemên wî yên herî navdar ev in:

- Sarya — 2020 (Peyv û awaz: Sîpan Xelat).
- Felek — 2020 (Peyv: Cegerxwîn, awaz: Huseyîn Tofe).
- Nebêje Min — 2021 (Peyv û awaz: Aras Erdalan).
- Delal — 2019 (Peyv: Ciwan Serhediyan, awaz : Mîr Perwer).
- Hewlêr- 2020(Peyv û awaz:Hozan Serhed).
- Çav Zextûna min (Peyv û awaz:Seydayê Bercîk )
- Rehşan (Peyv û awaz:koma Agirê Jiyan)

Mîr Perwer ne tenê dengbêj bû, di heman demê de nivîskar û bestekar bû, hevahengiyek kir di navbera peyv, awaz û stran di berhemên xwe de ,gelek stranên xwe yên navdar , peyv û awaz yên wî danîne , mîna:

- Bang - 2020.
- Rengîn- 2019.
- Çi bikim- 2021.
- Dilbera Min - 2021.
- Bê Dengî - 2021.
- Bajar- 2019.
- Dewre Zalim- 2019.
- Xecê û Siyabend - 2021.
- Navê Min doze.

Ev berhem bûn sedema ku cihê wî wekî yek ji pêşengên strana Kurdî bihêz bibe û mîrateyek hunerî ya mayînde ji xwe re bihêle.

Lê rêwîtiya wî ya hunerî, ku bi gavên piştrast ber bi gihîştin, pêşketin û belavbûnek mezintir ve diçû, bi awayekî trajîk qut bû. Di 23ê Kanûna Yekemê 2022 de, Mîr Perwer li nêzî Navenda Çandî ya Kurdî "Ehmed Kaya" li paytexta Parîsê rastî êrîşeke çekdar hat,di encamê de, Mîr Perwer , ligel Evîn Goyî, endama Desteya Rêvebir a KCK û welatparêz Ebdurrehman Qizil şehîd bû.

Cenazeyê Mîr Perwer piştî şehadeta wî ber bi bajarê wî yê li eyaleta Mûşê ve hat şandin ,li balafirgeha Mûşê, cenaze ji aliyê hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Bedran Ozturk, û gelek parlamenterên Partiya Gelan a Demokratîk (HDP),



ligel endamên malbata wî, hat wergirtin. Piştre cenaze hate veguhestin bajarokê Oran, da ku merasîma oxirkirin û veşartinê li wir were lidarxistin. Polîsên Tirk cenazeyê Mîr Perwer ji ber girseya gel bi rêyeke din veguhestin gund û hêzên cendirme jî dordoreke ewlekarî danîn û rêyên ku diçin wê girtin û nehiştin bi sedan kes beşdarî merasîma oxirkirina wî bibin. Bi vî awayî, axa ku ew lê hatibû dinyayê hestiyên hunermendê xwe himbêz kir, yê ku dengê xwe kiribû zimanê welatê xwe û strana xwe ji gelê xwe re kiribû peyamek û heta kêliyên dawî yên jiyana xwe dilsozê doza xwe ma.

Tevî kurtbûna jiyana wî û ezmûna wî ya hunerî, Mîr Perwer mîrateke hunerî ya nemir li pey xwe hişt, ew ne tenê stranbêjek bû, lê kaniyek diherikî ji awazan û dibistaneke hunerî bû ku gelek hunermendên ciwan ên Kurd ji wê ruhê strana Kurdî ya resen wergirtin , ji ezmûna wî fêr bûn ku çawa bi mîrata xwe ve girêdayî bimînin, dilsozê melodiya Kurdî bin, zimanê Kurdî biparêzin û hesta girêdana bi nasnameya neteweyî re di berhemên xwe de bihêz bikin.

Wî bawer dikir ku strana Kurdî ne tenê serişteyek ji bo şahî ye, lê peyameke çandî û bîreke neteweyî ye. Ji lewma , berhemên wî derbirîna hestên hesretê, xweparêzî, rûmetê dikirin û bi ruhê axa Kurdistanê û nebeza mirovê Kurd hatibûn dagirtin ,tevî ku ew zû ji cîhanê çû , lê stranên wî hîn jî di wijdana gelê wî de zindî dimînin, û şahidin ku hunera rastîn bi demê re nayê jibîrkirin.

Hunermend Mîr Perwer bi laşê xwe ji cîhanê koç kir , lê dengê wî hîn jî zindî dimîne , Çiya dengê wî vedigerînin, gund ew diparêzin, û bajar di helkeft û bîranînên xwe de bi bîr tîne, ew bûye sembola dilsoziyê ji zimanê Kurdî re, ji strana rastîn, û ji hunermendê ku hunera xwe kiriye peyam, û awaza xwe kiriye pirek ku nifşan bi hev ve girêdide.

Bi koça wî, netewa Kurd hunermendek, bestekarek û helbestvanekî hêja wenda kir, lê belê, mîrata wî dê her tim di bîra hunerî ya Kurdî de zindî bimîne, û navê Mîr Perwer dê bi rûmet di karnameya hunermendên zindawer yên Kurdistanê de were nexşandin , ji ber hunera wî ya rastîn û peyama wî ya bilind ku li pey xwe hiştîn.



Remezan Olçen

## Hîmê siberojê

Me heftiya bihurî di heman rûpelê de behsa bandora kûr a wêjeyê li ser hiş û dilê zarokan kiribû. Me gotibû ku pênûs amûreke berxwedan û kewandina birînan e. Lê belê, gava em behsa "Edebiyata Zarokan a Kurmancî" dikin, pirsa herî krîtîk ku derdikeve holê ev e: Ev wêje divê çawa be û pêvanên xwe çi ne?

Wêjeya zarokan ne amadekirina nivîsekê ye ku tekane ferqa wê kurtbûna hevokan be. Ew qadeke pisporiyê ye ku divê pîvanên pedagojîk, pêşketina derûnî ya zarok û rastiya civakî di hevsengiyeke dayne.

Nivîskarekî/e ku ji bo zarokan dinivîse, berî her tiştî divê ast û qonaxên pêşketina wan a derûnî û hişî baş nas bike. Zarokê ku di temenê navbera 3-6 saliyê de ye, cîhanê bi wêne, sembol û hestên sade fêm dike; zarokê 7-12 salî ber bi ramanên berbiçav û kûr ve gavan diavêje. Ji ber vê yekê, pedagojiya wêjeyî ji me re dibêje ku divê ziman û mijar tam li gorî temen û asta zarok werin bikaranîn.

Heke em xwestek û nêzîkatiya xwe ya "fêrkirinê" bi awayekî zêde, rasterast û rasterê bixin nav nivîsê, pirtûk ji wêjeyê derdikeve û dibe "broşûra şîretan". Zarok ji nivîsên ku domdar şîretan li wan dikin û dixwazin tim dersê bidin wan, hez nakin. Rol û hunera nivîskarê/a zarokan di vir de ye; Pêşkêşkirina rastiyan di nava cîhaneke estetîk, hestyarî û lîstikvanî de. Dema ku pedagojî û estetîk dibin yek, pirtûk ji bo zarok dibe hevalek ku bi kêf û şadî tê xwendin.

Zarokekî ku bê kok mezin bibe, mîna darake bê reh e ku di ba û bahozê de dikeve. Di nav mercên gelê me de, wêjeya zarokan di heman demê de xwedî erka girêdana zarok a bi çand, dîrok û rastiya wî re ye. Zarokê Kurd gava di nav çîrokan de behsa kelepora xwe, lehengên dîrokî, kevneşopiyên dewlemend û erdnîgariya xwe bixwîne, hesteke bihêz a aîdiyeta çandî di dilê wî de geş dibe.

Lê belê, fêrkirina nasname û dîrokê di wêjeya zarokan de nabe ku wîsa weke kronolojî were dayîn yan jî tenê nebe vegotina êş û azaran. Divê ev nasname ne weke tiştekî ku bi tenê girêdayî êşên pêşerojê ye, belku weke nirxekî zindî, dewlemend û avaker were pêşkêşkirin. Bi vê rêyê, zarok fêr dibe ku kî ye, ji ku derê tê û çawa dikare li ser van kokên zexm paşeroja xwe ava bike.

Zarok ne tenê pasîf wergirên dîrokê ne; ew înşakerên nû yên dîrokê ne. Edebiyatek ku tenê balê dikişîne ser rabirdûyê an jî xem û derdên rojane, nikare asoyên fireh bide zarokan. Wêjeya zarokan divê qadekî elaqedarî "siberojê" biafirîne. Zarokê ku bi rêya çîrokan çareserkirina pirsgirêkan, ramîna kûr, azadîxwazî û parastina nirxên gerdûnî fêr dibe, di heman demê de dibe avakerê civakeke nûjen û azad.

Asta gihîştina zarok, dema ku bi afirîneriyê re dibe yek, xeyalên wan, ew ber bi sînorên gerdûnî ve difirînin. Dema zarokek bi kurmancî behsa rêwîtiya stêrkan, teknolojiyê, çîrokên zanistî yan jî cîhaneke ku tê de aştî û edalet serwer e, bixwîne; fêm dike ku zimanê wî ne tenê zimanê rabirdûyê ye, zimanê paşeroj û hemû pêşketinên mirovahiyê ye jî.

Kurt û kurmancî geşkirina wêjeya zarokan ne erkeke beşekî li welêt e; ew projeyeke neteweyî, mirovî û pedagojîk e. Nivîskar, weşanger, mamoste û dê-bav divê pîvanên pedagojiyê baş nas bikin û zarokan di navenda vê pêvajoyê de bi cih bikin. Gava em pirtûkekê dixin destê zarokekî/e, em ne tenê çîrokekê didinêî; em mîftekî didin destê wî/ê ku dergehên hişmendî, nasname û xeyalan lê vedike. Ew zarokê ku îro bi zimanê xwe, bi rêbazên rast ên pedagojîk û bi hişmendiya nasnameya xwe pirtûkekê dixwîne, sibê wê bibe ronakbîr, hunermend, zanyar û avakerê azad ê vê axê. Her rûpela ku ji bo zarokan tê nivîsandin, danîna hîmê siberojeke ronî ye.

# Yekemîn Festîvala Genim li Bajarê Qamişlo

Rêveberê Komîteya Amadekar a Festîvala Genim li bajarê Qamişlo Ebdulrehman Hesen diyar kir ku herêma Cizîrê bi berhema genim navdar e, lewma wan xwest festîvaleke wiha li dar bixin da ku balê bişkînin li ser qûnax û awayên çandina genim ji demên kevin ve û heta niha.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Her bajarekî Sûriyê bi sembol û berehemkê navdar e, ev bajar da ku balêbikşînin li ser van berheman û girîngiya wê, festîvalan li dar dixin wekî festîvala Zeytûn, Pembo, Av û Tirşiyê. Vê sale li bajarê Qamişlo jî wê mîna van festîvalan Yekemîn Festîvala Genim di 29'ê Tîrmehê bê li dar xitin.

Genim yek ji berhemên herî girîng di cîhanê de ye, berî 10 hezar sal hat keşfkirin ji hêla mirovên berê û bi wan re berdewam kir heya gihaşt ber destê me. Xaka herêma me jî bi gelek çavkaniyan navdar e lê ya herî girîn ku gel jê sûdê dogrin û dikin xwarin genim e, gelek cureyên xwarinê ji genim derdikeve û bi awayên cuda têne xwarin. ji bo van girîngiyan jî Navenda Lêkolînên Çandiniyê yên Zanistî festîvala genim li bajarê Qamişlo li dar dixe û banga tevlîbûna gel da ku bi hev re bereketa erdê û mizgîniya berhemndariyê pîroz bikin, kir.

Derbarê amadekariyên festîvalê Rêveberê Komîteya Amadekar a Festîvala Genim li bajarê Hesekê Ebdulrehman Hesen ji rojnameya me re axivî

Rêveberê Komîteya Amadekar a Festîvala Genim li bajarê Hesekê Ebdulrehman Hesen wiha dest bi axaftina xwe kir: "Bajarê Hesekê bi berhema Genim navdar e, hem mirov kare bêje berhema herî sereke ye hem di herêmê de û li seranerî Sûriyê giştî, girîngiyek wê ya istatîjîk jî heye lewma me xwe di rêya vê festîvalê balê bikşînin li ser ji dema ku genim di qûnxa tovê de be, dema tê çandin û piştre dibe xwarine dighêje ber



dest gelan di heman demê de li ser çandiniya demên berê û ya niha bisekinin."

**'Armanca me ku Festîvala Genim bibe kevneşopiyek'**

Ebdulrehman Hesen destnîşan kir ku festîval wê di 29'ê Tîrmehê bê lidar xistin û wiha axaftina xwe berdewam kir: "Yekemîn Festîvala Genimê wê tenê rojek be, ji seat 8'ê danê sibehê heya 1'ê nîvro destpê bike û ji seat 4'ê piştî nîvor heta 8'ê êvarî û dibe ku dirêjtir bibe heya seat 10 an 11'ê êvarî, li gorî tevgera serlêdanên welatiyan berdewam be. Me cihê guncav ji bo li dar xistina festîvalê hilbijart ku li Stadyoma 12'ê Adarê ya bajarê Qamişlo pêk bê.

Ev nêzî meh û nîvek em hazirtiyan ji bo lidarxistina festîvalê kirin, festîvala genim dê tecrûbeya me ya yekemîn be, bê guman dibe ku jî hin kêmasî tê de derkevin, ji ber çi karê û xebatên ku bê kirin eger kêmasî tune be ne normal e. Em bi hêvîne ku ev gava me daye destpêkirin bi kêm şaştî û kêmasiyan derkeve û gel jê razî bin. Armanca me ew e ku di salên bê de kesên rêya me bişopînin û festîvala genim berdewam bikin da ku bibe kevneşopiyek ku her sal li bajarê Hesekê li dar bikeve û bipêş bikeve."

**Saziyên beşdarî Festîvala**



**Genim dibin ev in:**

Ebdulrehman Hesen wiha anî ziman: "Di destpêkê de me komîteyek ava kirk u ji gelek saziyan pêk tê wekî: Zanîngeha Rojava beşê çandiniyê, Navendên Lêkolînan yên Çandiniyê, Malbatên Şehîdan, Meclisa Bajarê Hesekê, Meclisa Bajarê Qamişlo, Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo, Şaredariya Gel a Bajarê Hesekê di heman demê de Hêzên Ewlekariya Giştî tê de beşdar bibin herwiha Yekîtiya Ciwanan û Yekîtiya Werzîşê, Kongra Star û Wqefeya Jinê, TEV-DEM'ê, Rêveberiya Desteya Çandê, Kar û Barên Civakî, ji xwe her yek ji van komîteyan wê erkê ku dikeve li ser mile wan bi cih bînin. Kar û xebat li ser van komîteyan hatiye dabeş kirin û têkiliyek baş di navbera de hatiye kirin ji bo ku festîval bi awayekî xweş û baş were li dar xistin."

**'Wê dewreya çandiniyê ji tovê bê nîşandan'**

Ebdulrehman Hesen bal kişand li ser naveroka festîvalê û wiha berdewam kir: "Di festîvalê de wê genim ji dema ku tê çandin di qûnxa tovê de û heta ku dibe firîk, genim, ard û savar, berhemên xwarinê yên ku ji genim derdikeve, çawaniya çandina wê ji demên kevin heya niha ve, çawaniya cotkirinê, çawa mirovan di demê borî de bi alavên kevin û bi destan karîbûn erdên xwe biçînin, wekî ajotina erdê bi sewalan wekî gamêşan an jî bi hespan û çêlekan. Li pey wê paleya ku bi destan dihat kirin, dask û qeynavên di tiliyan de. Herwiha starên ku dihat gotin di rêya tabloyên foloklorî û skêtşan wê bêne pêşandan. Wekî her kes jî dizane Genim berhemekî kevnar e ku di dîrokê de vedgere berî nêzî 15 hezar sal û bi mirovan re berdewam bûye."

**Tiştê ku bên pêşandan**

Ebdulrehman Hesen destnîşan kir ku di festîvalê de alavên çandiniyê yên kevnar wê bên pêşandan wekî Gêsin herwiha Destar ya ku genim hûr dikir, Melhêbê darî û yê Hesin ku çawa genim dihêrandin û ji kayê cuda dikirin û wiha got: "Yek ji van saziyan wê bi vê yekê wê eleqdar be ji bo pêşandan bike. Wekî din Navenda Lêkolînên Çandiniyê wê di mijarên çawaniya başkirina tovan eleqdar bin, herwiha çawa mirov karibe hilberîna wê zê zêde bike bi rê û alavên nûjen, wekî deraseyan, alavên rişandina dermanan wekî gubreyê, wê bêne pêşandan.

Di heman demê de di festîvalê de wê xwarinên ku ji genim derdikevin, ji nan û beşên wê wekî nanê sêlê, tenûr û yê stûr, semûn û şêraniyê ku ji genim çêdib, firîk û savar, teftî, şiîre wê bêne kelandin û pêşandan û bi buhayekî sembolîn bê firotin."

**Beşên taybet**

Ebdulrehman Hesen axaftina wiha domand: "Ji bilî van tiştên girêdayî genim û berhemên wê, tiştên taybet wê bêne pêşandan mîna Keça Kurda ku ji Maşûqê ye wê beşdarî festîvalê bibe, dê gelek tişên wê yên kevnar hene wê pêşkêş bike herwiha jineke Suryanî Sewik û Semûnan çêdike û ji xeynî wan çi kesên ku karin tiştên xwe pêşandan bikin wê tevlî li fesîvalê bibin."

**'Rewşa Sûriyê ji zehmetiyên herî sereke li pêşiya me'**

Ebdulrehman Hesen tekez kir ku yek ji zehmetiyên ku li pêşiya me derket ew e rewşa ku Sûriyê tê de derbas dibe û wiha anî ziman: "Herwiha di diyarkirina rojak u festîval bê li dar xistin hin zehmetî û astengî derketin, ji ber ku piraniya saziyên ku tevlî festîvalê bibin mijûl bûn di kar û xebatên xwe de, wekî din astengî di peydakirina wan tiştên ku di demên berê û kevnar de dihatin bikaranîn derket, ji ber ku her alavek li cihekî bû, me gelek astengî dît haye me ew berhev kirin."

Rêveberê Komîteya Amadekar a Festîvala Genim li bajarê Hesekê Ebdulrehman Hesen wiha gotin xwe qedand: "Îsal tenê me roje ji bo festîvalê diyar kir, lê di salên pêş de hilbet ev roj têrê neke, dibe ku bibe hefteye an çend rojan. Wekî din banga me ji bo raghandinê ye ku karîbin vê festîvalê bi awayeî baş bişopînin, herwiha em wekî komîteya amadekar hazirin çi ji bo berî festîvalê an jî piştî bidawîbûna wê ji bo nirxandinê û guhdariyê li her nirîn, nirxandin û rexneyan bikin, da ku em karibin ji van nerînan sûd bigrin bû bibe avaker."






# Ji sala 2019'an ve çavê Koçberên Serêkaniyê li vegera biewle ye

Çavê Koçberên Serêkaniyê ji sala 2019'an ve li vegera biewle ye, lê tevî pêşketinên di dosyayên koçberên Sûriyê de heta niha dosyaya Serêkaniyê nehatiye çareserkirin, ji ber ku bajêr hîn jî di bin kontrola Tirkiyê de ye û ferman ji Enqerê tên girtin. Ev rewş bûye sedem ku desthilatdariya hikumeta demkî li vir lawaz bimîne û heta niha tu gavên pratîkî û amadekirina şertên vegereke ewle nehatine avêtin.

**Ronaz Silêman**

7 sal ji dagirkirina Serêkaniyê ji aliyê dewleta Tirk ve ku encama operasyona leşkerî ya bi navê "Kanîya Aştiyê" bû, derbas bûne. Ev operasyon di 9'ê Cotmeha 2019'an de dest pê kir. Her çend hineta Tirkiyê ku hate ragihandin avakirina "herêmeke ewle" bû, lê di rastiyê de berevajî wê qewimî, herêm ewlehî û aramî winda kir û heta îro jî di bin giraniya binpêkirinên mafên mirovan û nebûna serweriya qanûnê de dijî.

**7 salên talankirinê**

Beriya 7 salan ev destdirêjiya leşkerî bû sedema koçberkirina zêdetirî 200 hezar niştecihên bingehîn ên herêmê. Tirkiyê û komên Artêşa Neteweyî ya Sûriyê yên ku piştgirîya wan dike, bi awayekî hovane avahiyên sivîlan topbaran kirin û milkên taybet ên niştecihên herêmê ji hemû pêkhateyan bi taybetî Kurdan, bi awayekî pergalî talan kirin. Herwiha van koman rê li ber sedan malbatên koçber girt ku vegerin mala xwe û milkên xwe bistînin.

**Hejamara Kurdan li Serêkaniyê ji nêzî 75 daketiye kêmtirî 50 kesan**

Heta niha jî deh hezaran ji niştecihên bingehîn bi zorê koçber in û di şert û mercên mirovahî yên dijwar de di kampên koçberan de dijîn. Ev kamp hîn ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve piştgirî û nasîna fermî wernegirtiye. Li gor texmînên rêxistinên serbixwe yên Sûriyê zêdetirî ji sedî 85 ji niştecihên Serêkaniyê hîn koçber in. Hejmara Kurdan jî li Serêkaniyê ji nêzî 75 hezar kesan daketiye kêmtirî 50 kesan. Herwiha hejmara Ermenî, Suryanî û Êzidiyan jî nehatiye zêdetir ji çend kesan. Ji aliyekî din ve hezaran malbatên ji herêmên din ên Sûriyê di malên niştecihên ku bi zorê hatine koçberkirin de, hatine bicihkirin.

**Guhertina demokrafîk a bi armanca jêbirina bîra çandî û dîrokî**

Hewldanên desthilatdarên Tirkiyê û komên çete ên girêdayî wê ji bo guhertina avahiya demografîk û çandî ya vê herêmê, bi rêya koçberkirina bi zorê, bicihkirina komên din di malên niştecihên bingehîn de û siyaseta aşkere ya Tirkkirinê, li gor qanûna navneteweyî û qanûna navneteweyî ya mirovahî sûcên ku berpirsiyarî lê tê xwestin in. Armanca van kiryaran guhertina nasnameya dîrokî, demografîk û çandî ya herêmê ye. Nebûna berpirsyariyê li Serêkaniyê, bû sedema belavbûna sûcên wek talan, dizî, kuştin û revandin. Nenbûna hesabdan û cezakirinê jî bû sedema domandina van binpêkirinan û zêdekirina êşa niştecihên herêmê.

**Peymana agirbestê**

Her çend Tirkiyê li gor peymana agirbestê ya ku di 17'ê Cotmeha 2019'an de bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re îmze kiribû, soz dabû ku mafên mirovan û civakên olî û etnîk biparêze, ewlehiya hemû niştecihên herêma ku dagir kiriye, misoger bike û ji bo ku zirar negihîje sivîlan û binesaziya sivîl herî zêde hişyar be. Lê ji berpirsiyariyên xwe dûr ket û çavê xwe li ser binpêkirin û sûcên berfireh girt. Ev yek bû sedema zêdebûna talan, dizî, kuştin, revandin û girtinên keyfî. Ev yek jî neyta Tirkiyê ya avakirina herêma bi ewle nîşan da ku tu ewlebûn bi xwe re ne anî, berovajî wê bêewlehî zêde kir.

**Desteserkirina milkên niştecihan**

Hebûna Kurdan li Serêkaniyê kemtirî 50 kesan maye, li Girê Spî jî hebûna Kurdan gihîştiye tenê çend malbatan, piştî ku berê nêzî ji sedî 30 ji niştecihên herêmê pêk tînan. Zêdetirî 6 hezar û 200 xanî, hezar û 200 dikan û saziya bazirganî an pîşesaziyê û nêzî mîlyonek donim erdên çandiniyê (100 hezar hektar) hatine desteserkirin, herwiha 52 gund ji niştecihên xwe yên bingehîn hatine vala kirin.

**Vegera derengmayî; 7 sal ji koçberkirina bi zorê û nebûna dadweriyê li Serêkaniyê**

Her çend piştî ketina rêjîma Eseed di 8'ê Kanûna 2024'an de welêt guhertinên mezin ên siyasî û ewlehiyê dît û hikumeta demkî hate avakirin ku bi wê re zêdetirî 1.76 milyon kes ji koçberên hundir vegeriyan herêmên xwe, lê hîn jî zêdetirî 150 hezar niştecihên bingehîn ên Serêkaniyê û Girê Spî bi zorê koçber in. Nêzî 40 hezar ji wan di şert û mercên mirovahî yên dijwar de dijîn. Ew nikarin vegerin bajarê xwe, ji ber binpêkirinên berdewam ên ku komên Artêşa Neteweyî ya Sûriyê di bin çavdêriya hêzên Tirkiyê an bi beşdariya wan de pêk tînin.

**Li Serêkaniyê gelek binpêkirinên li dijî qanûnê navnetewî û mirovahiyê pêk hatin**

Di 7 salên borî de, binpêkirinên pergalî û berfireh li dijî qanûna navneteweyî ya mafên mirovan hatine tomar kirin. Ev binpêkirin ji aliyê hêzên Tirkiyê û komên çete yên ku Tirkiyê piştgirîya wan dike ve, hatine kirin û di nav de kuştinên derveyî dadgehê, îdamên meydanî, girtinên keyfî, êşkence û xirabkirina muameleya girtîyan, herwiha destdanîn û desteserkirina berfireh a milkên niştecihên bingehîn ên Kurd, Ereb, Ermenî, Suryanî, Êzidî, Çeçen û pêkhateyên din hene. Di heman demê de, guhertinên demografîk ên kûr pêk hatin ku yek ji bingehên girîng ên cihêrengiya herêmê xist nav metirsiyê.

**Vegera koçberan sozeke ragihandî û astengkirineke berdewam**

Dema ku peymana di navbera hikumeta demkî û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) de hate îmzekirin, yek ji xalên wê sozeke exlaqî û siyasî pêk anî ku hemû koçber vegerin bajar, gund û cihên xwe û hikumeta demkî ya Sûriyê parastina wan misoger bike. Lê rêya di navbera nivîsê û rastiyê de hîn jî dirêjtir ji êşa 7 salan ma, ne rêkeftinên ewle ji bo vegerê hatin amadekirin, ne jî hawîrdorek ji bo parastinê hate avakirin û ne mekanîzmayên bi bandor ji bo vegerandina xanî û milkên wan hatin damezrandin.

**Pêşketinên berbiçav di dosyaya Serêkaniyê de nehatiye dîtin**

Piştî gelek mehan ji îmzekirina peymana 29'ê, di dosyeya koçberên Serêkaniyê de tu pêşketineke berbiçav nehatiye dîtin. Ji ber ku di rastiyê de bajarê Serêkaniyê hîn jî di bin kontrola hêzên Tirkiyê û komên çete yên alîgirê wê de ne. Ev kom bi awayekî şiklî di nav avahiya Wezareta Berevaniyê ya nû ya Sûriyê de hatine tevlîkirin, lê hîn jî piştgirî û fermanan ji Enqere werdigirin. Ev rewş bûye sedem ku desthilatdariya hikumeta demkî li wir lawaz bimîne û heta niha tu gavên pratîkî ji bo misogerkirina mafê xanî û milkê niştecihan an amadekirina şertên vegereke ewle nehatine avêtin.



Lê tişta ku hatiye kirin ew e ku di çarçoveya lihevkirinê de Komîteya Koçberên Serêkaniyê 3 caran bi Parêzgarê Hesekê re, 2 caran bi Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê Mezlûm Ebdî û Hevseroka Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Elham Ehmed, carekê bi hêzên ewlehiyê yên hikumeta demkî ku tê de Merwan El-Elî beşdar bû, 2 caran bi Cîgirê Fermandarê Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Hesekê Mehmûd Xelîl (Siyamend Efrîn) û 3 jî bi şanda hikumetê wefid rîasî Mistefa Ebdî hevdîtin pêk hatin.

**Çarçoveya qanûnî û berpirsiyariyan hikumeta demkî ya Sûriyê**

Hikumeta demkî ya Sûriyê berpirsiyariya rasterast hildigire ku mafên bingehîn ên niştecihên bingehîn û koçberan biparêze. Ev berpirsiyarî bi misogerkirina ewlehiya wan, pêşîlêgirtina binpêkirinan, vekirina lêkolînên serbixwe û bi bandor ku bibin sedema hesabdana sûcdaran û telafîkirina zirara qurbanan, pêk tê. Di heman demê de divê şertên vegereke ewle û bi rûmet amade bike, bi rêya rêkeftinên ewle ji bo gihîştinê, misogerkirina parastina takekesî û civakî, damezrandina mekanîzmayên zû ji bo vegerandina xanî, erd û milkên wan.

**Vegereke ewle gav pêşîn a bidawîkirina êşa salan e**

Ji bo vegereke bi ewle pêk were pêdivî bi van xalan heye ku werin bicihanîn: Misogerkirina vegereke ewle, bi rûmet, bi dilxwazî û bê derengî ji bo hemû koçberên Serêkaniyê li gor pîvanên parastina navneteweyî. Vegerandina hemû mafan bo xwediyên wan, di nav de vegerandina milkên ku bi awayekî keyfî hatine desteserkirin û damezrandina mekanîzmayên bi bandor ji bo telafîkirina zirarran û dadweriyê. Tevlîkirina binpêkirinên ku li Serêkaniyê hatine kirin di bernameyên dadweriya derbasbûnê ya neteweyî de, da ku nasîna qurbanan, eşkerekirina rastiyê, hesabdana sûcdaran, telafîkirina ziraran û misogerkirina ku ev sûc dubare nebin pêk were. Girêdana pêvajoya danûstandinê bi misogerkirina vegera koçberan. Herwiha desthilata niştecihên herêmê di destê wan de be ku karûbarên xwe bi rêya saziyên herêmî yên hilbijartî û hemû kes birêve bibin, bi armanca zêdekirina baweriyê û xurtkirina serweriya qanûnê. Dûrxistina av û çavkaniyên xwezayî ji kêşeyên siyasî. Tevlîkirina Serêkaniyê di planên saxkirina zû û avakirina nû de, bêyî ku ji veberhênan û xizmetên bingehîn bên derxistin, da ku şertên jiyana bi rûmet vegerin û aramiya herêmê were xurtkirin.

**Daxwazên bingehîn ên vegerê**

Dawîkirina dagirkeriyê, vegerandina koçberan bo mala xwe û qerebokirina zirardîtîyan ev yek jî di çarçoveyekê de ku hesabdan û dadwerî ji bo qurbanan misoger bike, daxwazên herî bingehîn in. Tu çareseriya aştiyane ya mayînde bêyî pêkanîna dadweriyê ji bo qurbanan û misogerbûna ku ev sûc dubare nebin, pêk nayê.

# ‘Herêmên Cerbandinê’ dê ji bo Lubnanê bibe çareserî?

Plana ‘Herêmên Cerbandin’ piştperdeya lihevkirina Amerîka, Îsraîl û Lubnanê ye, bingeha wê bêçekirina Hizbullah û vekişîna Îsraîlê ji xaka Lubnanê ye. Hikumeta demkî ya Sûriyê jî beşek ji vê planê ye. Pirs ev e: Gelo ev plan wê çareseriyê bo Lubnanê bîne yan wê kirîzê kûrtir bike?

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**



Di 21’ê Tîrmehê de wesayîtên artêşa Lubnanê ketin bajarokê Zowter a rojava hin ji wan ala Lubnanê radikirin, ev yek wekî gava yekem a ber bi vekişîna gav bi gav a Îsraîlê ji başûrê Lubnanê xuya dikir. Lê belê, ev rewş zêde dewam nekir. Tenê çend demjimêr bi şûn de, artêşa Lubnanê ragihand ku hêzên Îsraîlê li nêzî xaleke wê gule barand û ev yek bi bombebaran û topbarana Îsraîlê ya li ser bajarên hawîrdor re bû hevdem.
Rastiya tiştên ku di rojên dawî de qewimin ev e gaveke berbiçav li ser erdê hat avêtin, lê gaveke pir sînordar e têkildarî vekişîneke gitşî ya Îsraîlê ji başûrê Lubnanê.
Peymana ku di navbera hikûmetên Lubnanî û Îsraîlê de hatiye îmzekirin weke rêyek ji bo vegerandina serweriyê hatiye pêşkêşkirin, dewleta Lubnanê dixe ber çend ceribandinan, bi taybetî jî bêçekkirina Hizbullahê. Di vê navberê de derbasbûna qonaxa din bi nirxandinekê ve girêdayî ye ew jî mekanîzmaya wê hîn nehatiye dawîkirin. Ev peyman li ser hin herêmên Lubnanê sînordar dimîne û bi navê Herêmên Ceribandinê tê nasîn.

**Pêkanîna Herêmên Ceribandinê çawa dest pê kir?**

Pêvajo bi ketina artêşê bo Zewter a rojava di 21’ê Tîrmehê de dest pê nekir. Berevajî vê ew yekem pêkanîna pratîkî ya lihevkirinên berî çend hefteyan hatibûn bidestxistin bû û paşê ji çarçoveya siyasî derbasî rêkeftinên ewlehiyê yên li ser erdê bûn. Di 26’ê Hezîranê de, peymanek di bin çavdêriya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de hat îmzekirin, ev peyman li ser bicihkirina artêşa Lubnanî li deverên taybetî û bêçekirina komên leşkerî yên nehikûmî ji wan di serî de Hizbullah tekez dike, bi şertê ku vekişîna Îsraîlî qonax bi qonax ji deverên dagirkirî de, pêkwere.
Di gera şeşemîn a danûstandinên rasterast de, ku di nîvê Tîrmehê de li Romayê hat lidarxistin, rayedarekî Amerîkî diyar kir ku her du alî li ser binesazî û rêbernameyên pratîkî ji bo Herêmên Ceribandinê li hev kirine û di rojên pêş de wê werin bicihkirin. Hevdîtinên di navbera şandeyên Lubnanî û Îsraîlê de li Balyozxaneya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Romayê pêkhatin. Di 20’ê Tîrmehê de Wezareta Derve ya Dewletên Yekbûyî destpêkirina pêkanînê li Frun, Srîfa û Zewter a rojava ragihand. Di 21’ê heman mehê de artêş ket nav Zewter û tîmên endezyariyê dest bi lêkolîna rêyan kirin ji bo teqemenî û bermahiyên ku ji hêla hêzên Îsraîlê ve hatine hiştin, bi erkê xwe rabin. Artêşê ji niştecihan xwest ku heta ku rewşa ewlehiyê aram nebe venegerin. Lê tevlîheviya yekem di heman rojê de çêbû. Artêşa Lubnanê ragihand ku hêzên Îsraîlê ji nêzîk ve gule li yekîneyên wê barandin, lewma artêşê hişyarî da ku ev êriş dibe astengiyek li heberî pêkanîna gavên bicihkirina peymanê.
Li hêla din artêşa Îsraîlê diyar kir ku wê guleyên hişyariyê li leşkerên Lubnanî yên ku xeta lihevkirî derbas kiribûn, barandine. Bi vî awayî peyman bi nîqaşek li ser hûrguliyên wê yên herî hêsan dest pê kir, wê lingê Artêşa Îsraîlê li ku bimîne û desthilata artêşa Lubnanê li ku dest pê dike? kî xwediyê desthilatê ye ku binpêkirina peymanê şîrove bike?

**Gelo vekişîneke rastîn a Îsraîlê li gorî peymanê pêkhat?**

Li gorî Reutersê Artêşa Lubnanê piştî vekişîna hêzên Îsraîlê, derbasî Zewter a rojava bû, lê belê rewşa li ser erdê wêneyekî tevlîhevtir nîşan da.
Îsraîlê qet hebûneke leşkerî ya mayînde li Frun û Sarifayê negirt, lê hebûna wê li Zewter û derdora bajêr kom bû, ev yek jî ji bo pêkanîna tektîkên êrişkirinê pêkhat.
Berevajî vê hêzên wê li Zewter a rojhilat herwiha li ser girê stratejîk ê Elî el-Taher û deverên din man. Ji ber vê yekê, Herêma Cerbandinê ya yekem dê nebe sedema vekişîna Îsraîlê, ji ber ku ew li bajarokên ku Îsraîlê di dema şer de dagir nekirine ye.
Hêzên Îsraîlê negihîştine Frunê, tevî ku hat topbarankirin. Meclisa şaredariya Frunê ragihand ku bajarokê Frunê nehatiye dagirkirin û nakeve nav xeta zer. Ji ber vê yekê tiştê ku li Zewtera rojava qewimî, bêtir nêzîkî veguheztinek sînorkirî ye ku rê da artêşa Lubnanî ku bikeve hundir, ne vekişînek ji xeta ku bi qasî 10 kîlometreyan dirêj dibe nav Lubnanê. Tuggeneral Ilyas Hanna da zanîn ku her sê bajarok ji sedî 2 nêzîkî 600 kîlometreçargoşeyî yên ku ji hêla Îsraîlê ve têne kontrol kirin pêknaynin. Li hêla din tuggeneral Hesen Jounî destnîşand kir ku mezintirîn pirsgirêk dê veguheztina ber bi deverên dagirkirî ne û vekişîna Artêşa Îsraîlê ji wan, be.

**Gelo niştecihên Herêma Cerbandinê dikarin vegerin warê xwe?**

Li pişt vê nîqaşa siyasî û rewşa ewlehiyê ya ne aram gund wêranbûyî hene, herwiha şîneyên wê herêmê li benda vegerê ne.
Raporên meydanî behsa bajarokên ku piraniya mal û xizmetên xwe yên bingehîn winda kirine dikin, amar dibêjin ku tenê li Frunê, nêzîkî ji sedî 80 xaniyên gund zirar dîtine, di heman demê de rê hîn jî hewcedarî kontrolkirin û paqijkirina ji mayînan e da ku şîneyên wê herêmê biewle vegerin malên xwe.
Ji ber vê yekê serkeftina operasyonê tenê bi bicihkirina artêşê nayê sînordarkirin, lê bi şiyana wê ya vekirina rê ji bo vegera mirovan bo malên ku gelek ji wan êdî ne guncaw in, ve girêdayî ye, ev xal jî ji hemû xalên din girîngtir e.

**Kî di bin tecrubeyê de ye?**

Îsraîl Herêmên Ceribandinê wekî ceribandinekê ji bo serweriya Artêşa Lubnanê bi nav dike, ji ber ku ew tenê desthilata rewa ya ku destûr heye ku çekan hilgire ye.
Li gorî Reutersê, rayedarekî Amerîkî got ku ev yek derfetekê dide Lubnanê ku dest bi vegerandina kontrola xwe li ser deverên ku berê di bin serdestiya Hizbullah de bûn, bike.
Lê belê peyman demek diyarkirî ji bo vekişînên Îsraîlê bo erda Lubnanê paşê diyar nake.
Axios ji rayedarekî Amerîkî da xuyakiriin ku danûstandin hîn jî berdewam in li ser aliyê ku ji bo bide piştraskirin ku ew herêmê ji çekên Hizbullah vala ne, herwiha qonaxa duyemîn dê dest pê neke heya ku ev piştraskirin temam nebe. Di pratîkê de ev tê vê wateyê ku divê Lubnan pêşî serkeftina xwe îspat bike, di heman demê de Îsraîl şiyana xwe ya îtîrazkirina encaman û derengxistina vekişîna xwe biparêze.

**Hevdîtina Trump û Ewn**

Li gorî vê hevdîtin û axaftinên serokê Lubnanê Cuzêf Ewn û Trumû, hêzên Lubnanê dê berpirsiyariya kontrolkirina van deveran û xebata ji bo bêçekkirina Hizbullahê bigirin ser milê xwe, di heman demê de artêşa Îsraîlê dê vekişînek gav bi gav pêkbîne.
Rêveberê Enstîtuya Siyaseta Alternatîf li Beyrûtê Sami Helabî da zanîn ku plan dibe têkbiçe û artêşa Lubnanê ji hêla teknîkî ve nikaribe erkên xwe bi cih bîne dibe ku ew neçar bibe li ser navê Îsraîlê bi Hizbullahê re rûbirû bimîne.
Hizbullah peymanê, plana bêçekkirinê û encamên danûstandinên rasterast bi Îsraîlê re red dike, artêşê dixe rewşeke tengas û hestyar.
Li hêla din serokê Lubnanê ji rêveberiya Dewletên Yekbûyî piştgiriyek mezintir dixwaze da ku peymana ku bi Îsraîlê re hatiye îmzekirin bi cih bîne, artêşa Lubnanê xurt bike û di vejandina aboriya Lubnanê de bibe alîkar.
Peyman di serî de armanc dike ku Hizbullah bêçek bike, vekişîna gav bi gav a hêzên Îsraîlê hêsan bike û rê li ber têkiliyên aştiyane di navbera her du welatan de veke.
Trump her wiha behsa roleke muhtemel a Serokê Sûriyê Ehmed Elşera di rewşa Lubnanê de kir û diyar kir ku Şera dixwaze destwerdanê bike. Serdana nêzîkî du saetan a Ewn bo Qesra Spî di demekê de tê ku hêzên Îsraîlê beşeke mezin ji başûrê Lubnanê dagir kirine û bi sed hezaran Lubnanî piştî êrîşên Îsraîlê bê cih û war mane, pêkhat. Çend demjimêr beriya hevdîtina Ewn bi Trump re, artêşa Lubnanê dest bi kontrolkirina axa li başûrê Lubnanê kir û hêzên Îsraîlê jê vekişiyan, ev yek ceribandina yekem a peymana 26’ê Hizîranê bû.
Li gorî Ajansa Nûçeyan a Neteweyî ya Lubnanê tevî van pêşketinan, artêşa Îsraîlê bi pêkanîna rêzeteqînên mezin li deverên cûda yên başûrê Lubnanê, peymanê bin pê kir.
Li gorî Wezareta Tenduristiyê ya Lubnanê, êrşên Îsraîlê ya li dijî Lubnanê ku di 2’ê Adara 2026’an de dest pê kir, bûne sedema kuştina 4 hezar û 328 kesan û birîndarkirina 12 hezar û 230 kesên din.



Pêjder Altan

## Siya kûr a Tirkiyê di Meclisa Şamê de

Dema veguhêz li Sûriyê ne tenê ji nû ve jidayikbûna dewleteke, lê di heman demê de pirsa ku di vê welidandinê de ji aliyê kîjan destan ve tê şekilkirin jî dihewîne. Meclîsa Şamê jî tam di navenda vê pirsî de disekine. Li ser kaxizê desteya destûrî, nûnerê îradeya gel, parsuyê pêvajoya veguheziyê ava dike. Lê di pratîkê de, ev meclîs çawa hatiye avakirin, ji kî/ê an jî kesan pêk tê û ji kîjan bandora hêzên derve re vekiriye, paşeroja Sûriyeyê çawa diyar dike pirsgirêka esasî ye.
Dema mirov li rewşê dinêrin, tê dîtin ku meclîs di bin navê “rewatiya demkî” de, ne bi vîna rasterast a gel e, berovajî wek e pêkateyek hîbrît a mekanîzmaya tayînkirinê û hilbijartina dorveger hatiye çêkirin. Ji ber ku ji 210 endamên meclîsê 170’ê wê bi awayek hilbijartineke nerasterast ango dorvegerî, 70’ê jê jî ji aliyê serokkomar ve hatiye tayînkirin. Ev yek, hêj di serî de serbûxwebûna meclîsê dixe rewşeke nîqaşê. Ji ber ku ne bi îradeya gel, hevsengiyên hêzên serdema veguhez diyarker dibe.
Yek ji van hevsengiyên hêzan a tê dîtin jî Tirkiye ye. Ji ber ku dewleta Tirk ne wek siza, rasterast di meclîsa Şamê de bicih bûye.
Dema em pêşketinên di Şamê de çêdibin dinêrin, bandora dewleta Tirk a di meclîsa Şamê de ne di asta “Nifuza heremî” de, zêdetir bicihbûneke pir kurtir û bi sazîbûn e.
Li gor agahiyên ji Şamê tên, ji nîvê zêdetir a endamên meclîsê ji cot nasnameya hemwelatiyê Tirkiyê ne. Ev, ne nifusek dîplomatîk a ji rêzê ye; rasterast sazîbûna di nava hev de ye. Mînak serokê meclîsa Şamê Abdulhamîd Akil El Awak bi salane di Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê de peywirdare û li ser navê akademisyentiyê wek e mîmarê reşnivîsa yasaya giştî ya demkî derdikeve pêş, nîşaneya şênber a ku Tirkiye stratejiya gihandina elîta rêveberiya nû ya Sûriyeyê ava dike.
Hevdîtinên di navbêra Patrîkxaneya Ortodoks a Suryanî û rayedarên Tirkiyeyê de, dîsa li ser navê hin kesên ku wek e endamê MÎT’ê dixebitin û wek e serok eşîran didin nîşandan hevdîtin tên kirin, her wiha hin endamên ENKS’ê ku rasterast bi Enqereyê re nava têkiliyê de ne di meclîsê de hatine bicihkirin… Ev hemû, Tirkiye ne tenê wek e “bandorker” a di meclîsa Şamê de ye, aktoreke ku rasterast şikil dide meclîsê ye. Desthilatiyên ku xistine bin siya meclîsa Şamê de, bandora Tirkiyeyê hîn krîtîktir dike. Ji ber ku ev hêz rasterast li ser deverên ku dê pêşeroja Sûriyeyê diyar bikin, bandorê dikin.
Wek e; derxistina desturê, erêkirina hevpeymanên navneteweyî, diyarkirina butçeyê, lêpirsinkirina wezaretan, îlankirina efuya giştî û hwd. Ev desthilatiyên me qala wan kir, bi taybetî ji bo heremên Rojavayê Kurdistanê jiyanî ye. Ji ber ku vê desthilatiya di destê meclîsê de wê dewleta Tirk hemû li gor berjewendiyên xwe bikar bîne. Ji ber ku wê Tirkiye di bin navê parastina ewlehiya netewî mudaxeleya xwe ya li ser heremên Kurd, peravê, Suwêdiya û hwd de rewa nîşan bide wê vê desthilata meclîsê bikar bîne.
Yasayên ku dê mafên çandî, siyasî û îdarî ya Kurdan diyar bike, dibe ku di destê aligirên dewleta Tirk de bibe amûrekê zext û tehdîdê. Dikare destura butçeyê, marjînalkirina aborî ya Rojava de bikar bîne. Di ser meclîsê de bi riya hevpeymanên navneteweyî, hebûna leşkerî ya dewleta Tirk a di Sûriyê de dikare mayînde bike.
Ev tablo, nîşan dide ku di dema veguhez a Sûriyeyê dê çawa binê têgeha “ewlekariya netewî” vala bike.
Ev ne tenê krîzeke temsîlê ye; ev tê wateya pêvajoya jinûve avakirina dewletê dê ji aliyê hêzên derve ve were diyarkirin. Elîtên siyasî ku li gor piştgirîvanên derve were şekildan, destura bingehîn li gor hevsengiyên demkî were nivisandin, zexta li ser heremên Kurdan û civakên din bixe halê sazîbûyînê… Ev hemû, rasterast girêdayê lawazbûna serbûxweyiya meclîsê ye.
Halê hazir pêdiviya Sûriyê, meclîsekê ku dema veguhez karibe birêve bibe, serbûxwe, pirrengî û vîna gel tê de were teyisandin ava bibe.
Eger ev çênebe; bihara gelan di rê de ye. Û ez bawerim evcar wê pir cuda be.



# Jiyana komînal ji komînaliya seretayî heta projeya Civaka Demokratîk... (2)

**Dijwar Ehmed Axa**

**Rêber Abdullah Ocalan û ji nû ve pênasekirina jiyana komînalî**

Vebijarkên felsefî yên ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi taybetî ji destpêka sedsala 21’an ve pêşkêş kirin, di nêzîkatiya wî ya mijara dewlet û civakê de, guherîneke bingehîn pêk anîn. Piştî ku di nivîsên wî yên destpêkê de bal li ser dewleta neteweyî hate kişandin, paşê wî vê modelê rexne kir û got ku dewleta nûjen, her çi jî pergala wê be, di bingeh de li ser navendîbûna desthilatê, monopolîkirina biryarê û qelskirina çalakiyên civakî ava dibe. Ji vê xwendina xwe re, Rêber Abdullah Ocalan projeyeke alternatîf pêşkêş dike ku civakê vegerîne cihê wê yê sereke wek fikra bingehîn a rêxistinkirina jiyana giştî. Ev projey bi têgîna “konfederalîzma demokratîk” tê pêşkêşkirin ku ne dewleteke nû ye, lê tora civakan, dezgehên civakî û meilîsên gel e ku karûbarên xwe bi xwe bir ve dibin, herwiha di navbera xwe de li ser bingehê erka azad û hevkariya hevdem têkiliyê dikin. Ev nêrîn ji nû ve zindîkirina fikra komînalî di serdema nûjen de ye, ji ber ku roleke navendî dide civakê, ne dewletê.

**Komîn hucreya yekem a civakê**

Rêber Abdullah Ocalan komîn dike navenda projeya xwe ya felsefî, wê wek yekîneya bingehîn dibîne ku hemî saziyên civaka demokratîk ji wê dest pê dikin. Komîn li gor vê têgihiştinê, komek niştecîhên taxek, gundek an herêmek taybet e ku endamên wê bi rêkûpêk ji bo guftûgoya pirsgirêkên jiyana rojane dicivin û biryaran li ser wan didin. Rola komînê ne tenê rêveberî ye, lê di hemû waran de dirêj dibe mîna: Xizmet, perwerde, tenduristî, aboriya herêmî, çareserkirina nakokiyan, piştgirîya civakî û pêşxistina hevkariya nav gel. Di hundurê komînê de komîteyên taybet ên jin, ciwan, aborî, jîngeh, perwerde, xizmet, aştî û parastin têne avakirin. Ev komîn paşê bi meclisên mezintir ve tê girêdan, heta astên koordînasyonê yên berfireh, bêyî ku serbixwehiya komînê ji holê were rakirin. Bi vî awayî biryar ji jêr ber bi jor têne avakirin, ne ji navenda dûr li ser gel têne ferzkirin.

**Neteweya Demokratîk civak berî dewletê**

Di felsefeya Rêber Abdullah Ocalan de, têgîna “Neteweya Demokratîk” jî bingehîn e û ew wek alternatîfa dewleta neteweyî. Dewleta neteweyî li ser yek nasname, yek desthilat û sînorek tê avakirin, lê Neteweya Demokratîk li ser pirrengiya çandî, etnîk, olî û mafê civakan ji bo rêxistina xwe di çarçoveya demokratîk de tê avakirin. Li gor wî, yekîtiya civakê ne bi navenda hêzdar, lê bi beşdariya azad û razîbûna hevpar tê pêk anîn. Demokrasî ne tenê di hilbijartinan de ye, lê di jiyana rojane de ye, ji tax û gund dest pê dike. Di vê çarçoveyê de, azadiya ferdî û berpirsiyariya civakî bi hev re tê girêdan.

**Jin, jîngeh û aboriya civakî**

Projeya komînalî tenê avakirina saziyên siyasî nîne, lê ji nû ve avakirina têkiliyên civakî û aborî jî tê de heye. Azadiya jinê di navenda vê projeyê de ye. Rêber Abdullah Ocalan dibêje dîrok bi zordestiya jinê ve girêdayî ye û civakeke demokratîk bê beşdariya wekhev a jinan pêk nayê. Ji ber vê yekê, beşdariya jinan di hemû astên biryarê de bingehîn e. (Mînaka Jinwar wek gundê jinan).
Di warê jîngehê de jî, mirov ne xwediyê xwezayê ye, lê beşek ji wê ye. Aboriya ku serfêzî û talankirina çavkaniyan pêk tîne, kirîzên jîngehî çêdike. Ji ber vê yekê aboriya civakî ya hevseng pêdivî ye. Di warê aborî de jî, hevkarî û Kooperatîf tê pêşniyarkirin, ji ber ku aborî divê xizmeta civakê bike, ne ku bibe amûra dewlemendbûnê ya kesan.

**Jiyana komînalî di navbera teorî û pratîkê de**

Jiyana komînalî li ser vê ramanê ye ku civak dikare xwe bi beşdariya rasterast rêxistin bike. Demokrasiya rastîn rojane di komîn û meclisan de tê meşandin, ne tenê di hilbijartinan de. Hêzên piştgir dibêjin ev model beşdariyê zêde dike, kontrola civakî zêdetir dike, burokrasiyê kêm dike û fêrbûna hevkariyê pêş dixe. Lê rexnegir dibêjin ku di civakên mezin de ev model dikare dijwar be, bi taybetî di warên siyaseta derve, parastin û aboriya neteweyî de. Serkeftina wê bi hişmendiya civakî û şertên siyasî yên aram ve, girêdayî ye.



**Dîtina ji siyaseta derbasbûyî**

Girîngiya vê nêrînê ew e ku demokrasî ne tenê pergala hilbijartinê ye, lê şêwaza jiyanê ye. Civak ne tenê wergirê biryarê ye, lê hilberînerê wê ye. Ev nêrîn nîqaşeke felsefî li ser têkiliya dewlet û civakê dike: Gelo dewlet tenê çarçoveya rêveberiyê ye, an jî civak dikare xwe bi awayên din jî rêxistin bike? Mirov dikare bibêje ku ji hevraştina komelî ya seretayî heya Komûna Parîsê û heta projeya Rêber Abdullah Ocalan ya komîn û konfederalîzma demokratîk, rêya li ber civakeke adil û beşdar, her dem di felsefeya mirovî de maye. Ev têgihiştin nîşan dide ku jiyana komînalî tenê modela rêveberiyê nîne, lê dîtineke felsefî ye ku civak dike navenda biryarê. Di heman demê de, serkeftina wê bi şert û mercên civakî, siyasî û bi hevsengiya navbera xweserî û koordînasyonê ve, girêdayî ye.

**Nêrînên bingehîn ên Peyama Rêber Apo ji bo Rojnemeya “Komînal”**

**Derbasbûna ji qada nasîna xwe ber bi azadiyê**

Di peyama xwe de Rêber Apo destnîşan dike ku civaka Kurd di dema nû de gihîştiye qonaxeke nû. Li gor wî, şerê dirêj ê naskirin û îsbatkirina hebûna Kurdan bi awayekî dîrokî bi ser ketiye. Kurd niha wek rastiyeke civakî û dîrokî têne qebûlkirin û ev qonax bi serkeftina mezin a têkoşîna demdirêj tê hesibandin. Lê belê Rêber Apo dibêje ku îsbatkirina hebûnê tenê qada yekem e. Qada bingehîn a niha, qada azadiyê ye. Ev pêvajo nîşan dide ku pirsa sereke niha ne “hebûn heye an na?” e, lê “çawa ev hebûn bijî ?” e.

**Kiriza dewlet-netew û sînorkirina modela klasîk**

Rêber Apo rexne dike ku modela dewleta neteweyî û sosyalîzma dewletî nikarin bersiva pirsgirêkên civakî bidin. Ev model li şûna azadiyê, zêdetir navendîbûn, kontrol û îdareya hişk afirand. Li gor Rêber Apo, şertên nû yên dîrokî pêdivî bi modelên nû yên rêxistinê hene. Ji ber vê yekê, têgihiştina “Civaka Demokratîk” û “Modernîteya Demokratîk” wek alternatîf tê pêşniyarkirin ku di wê de civak xwe bi xwe birêxistin dike, ne ku ji jor were rêvebirin.



**Rola PKK’ê û derbasbûna qonaxekê**

Di peyamê de tê gotin ku Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) rola xwe ya dîrokî di qada îsbatkirina hebûna Kurdan de bi ser ketî ye. Bi vî awayî, qonaxa şerê hebûnê bi encam hat. Rêber Apo dibêje ku PKK’ê di şertên pir dijwar de şopên girîng ava kir û civak ji nû ve hişyar kir. Lê niha şert guhertine û pêdivî bi qonaxeke nû heye. Ev qonax ne şerê hebûnê ye, lê avakirina jiyana azad e. Ji ber vê yekê, derbasbûna ji modela partî û şerê neteweyî ber bi rêxistina civakî ya berfireh tê ragihandin.

**Komîn û rêxistina jiyana rojane**

Di peyamê de komîn wek bingehê jiyana nû, tê diyarkirin. Rêber Apo tekez dike ku azadiya rastîn tenê di nav jiyana rojane de, bi rêxistina civakî, komîn û meclisan pêk hatin. Kooperatîf, rêxistinên jin û ciwanan, avakirina nû ya exlaqî û çandî wek stûnên sereke yên vê modelê têne binavkirin. Ev hêman divê civakê ji navenda dewletê derxînin û hêzê bidin gel. Li gor Rêber Apo komîn ne tenê yekîneya îdarî ye, lê şêweyek jiyanê ye ku tê de berpirsiyariya hevpar û beşdariya rasterast bingeh e.

**Roleke nû ya weşan û ragihandinê**

Di peyamê de tê gotin ku weşan û ragihandin divê ne tenê teoriyan biafirînin, lê di heman demê de bi jiyanê ve girêdayî bin. Rojname divê karibe civakê organîze bike, rêbaz û tecrûbeyên pratîk nîşan bide û bibe amûrek ji bo avakirina civaka demokratîk. Komînal wek navgîneke nû tê nasîn ku divê dengê qonaxa nû be û li ser bingehê komîn û civaka demokratîk xebat bike.

**Komeleya demokratîk wek projeya jiyana nû**

Rêber Apo dibêje ku serkeftina rastîn ne tenê di guhertina navê saziyê de ye, lê di guhertina şêwaza jiyanê de ye. Civaka demokratîk divê li ser bingehê xwerêxistina civakî, beşdariya jin, ciwanan û parastina jîngehê pêk were. Ev model li hemberî sîstema kapîtalîst wek alternatîfek jiyanê tê pêşniyarkirin. Li gor Rêber Apo parastina civakê bi komîn û rêxistina gel re şertê bingehîn ê serdema nû ye.

**Qonaxa komînalî û berpirsyariyên nû**

Di dawiyê de tê destnîşankirin ku em di qonaxeke dîrokî ya nû de ne. Ev qonax ne tenê guherîna sazî ye, lê guherîna felsefî û jiyanî ye. Rêber Apo tekez dike ku Komînal divê ne tenê weşanek be, lê bibe dengê avakirina civaka nû, rêberê têgihiştina komînalî û amûra pêşxistina têkoşîna demokratîk. Ev nêrîn di dawiyê de bi gotina “Israr li ser sosyalîzmê, israr li ser komînalî ye” tê bi encam kirin, wek şîroveya berxwedan û jiyana hevpar.

**Çavkanî**

Karl Marx – Şerê Navxweyî li Fransayê
Murray Bookchin – Şaredariya Azad
Rêber Abdullah Ocalan– Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk: Sosyolojiya Azadiyê